ÇAPA EWROPA
RÛDAW
ROJNAMEYA KURDÊN DIYASPORA

Ezê Çiyayê Sefîn paqij bikim

» 8

Rawestgeha dawî: YEWNAN

Dema ku koça ber bi Ewropayê di girtîgehên yewnanî de bi dawî dibe

6 »

Hejmar / Nr. 216
19 Îlon / September 2013

Deutschland	1,50	Euro
Österreich	1,50	Euro
Belgium	1,50	Euro
Danmark	15,00	DKK
France	1,50	Euro
Nederland	1,80	Euro
Norway	15	NOK
Schweiz	2,70	CHF
Sverige	21,00	SEK

www.rudaw.eu
info@rudaw.eu

"Bila xelk herdu çavên min derxînin"

» 11

Dilşad Mihemed Seîd:

"Elektrîk û tiştên din ji mûzîkê girîngtir in"

» 9

Endamên koma "Ya hero ya mero" li dadgehê ne

Endamên koma motorsîklêtan a bi navê "Red Legion", ku gellek jê Kurd in, ji ber kuştina endamekî koma "Black-Jackets" a pirraniya endamên wê Tirk, derketin pêşberî dadger.

Di 22yê Kanûna 2012ê de li bajarê Esslingena Almanyayê pevçûnek di navbera herdu komên ku pirraniya endamên wan ji ciwanên kurd û tirk pêk tên derketibû û di encamê de ciwanekî ji koma "Black-Jackets" jiyana xwe ji dest dabû. Di şerê bi kêr û daran de gellek kes jî birîndar bibûn. Tê texmînkirin ku sedema şerê rûdayî "desthilatdariya herêman" e. Li ser vê bûyerê jî doz li dijî 11 endamên "Red Legion" ji ber kuştina bi qest hatibû vekirin. Piştî bûyerê wezîrê karê hundir yê eyaleta Baden-Wurttenbergê, Reinhold Gall, koma "Red Legion" qedexe kiribû.

Dadgeha ku roja duşemê destpêkir, wê piştî 50 rûniştinan di destpêka sala 2014ê de bi encam bibê. Balkêş bû ku dema bersûc hatin dadgehê, ew ji hêla 40 alîgiran xwe ve bi coş hatin pêşwazîkirin.

Endamên komekê Tirk in û yên koma din Kurd in

Koma motorsîklêtan ya Black Jackets di sala 1985ê de li bajarê Heidenheimê yê li başûrê Almanyayê hat damezirandin û pirraniya endamên wê Tirk in. Niha jî bi sedan endamên vê komê hene. Li ser cakêtê endamên komê slogana "Forever friends" (Hevaltiya heta hetayê) heye. Lê gellek endamên vê komê wekî kesên xeternak tênê zanîn û bi karê jinfiroşiyê ve mijûl in. Herwiha kontrola gellek deriyên cihên wekî dîskotek, bar û kerxaneyan jî di destê hinek endamên wê de ye.

Koma "Red Legion" jî wekî komên din ên motorsîklêtan tevdigere lê ew motorsîklêtan bikarnayînin. Gellek endamên vê komê ciwanên kurd in. Li gor daneyên polîsan, beriya ev kom were qedexekirin 110 endamên wê hebûn. Li ser cilên wan jî kurtiya Red Legion "LG" heye û herwiha bi kurdî jî nivîsa biçûk "Ya hero ya mero", ango "an hertişt, an qet", li tenişta logoya wan cih digire.

Kurdî li ser lewheyên Londonê

Köln (Rûdaw) - Lewheyên bi kurdî, tirkî û yewnanî yên şaredariya taxa Muswell Hill ya Londona paytexta Brîtanyayê bûn sedema nerazîbûnên şêniyên biyanî.

Şaredariya taxa Muswell Hill bi armanca ku welatî çopa xwe navêjin erdê û taxê paqij bihêlin, lewheyên bi zimanên kurdî, tirkî û yewnanî li gellek cihan daleqand. Lê belê ji ber ku li ser lewheyan hişyarî bi zimanê ingilîzî nehatibû nivîsanda, gellek welatiyan bertek nîşan dan. Hat diyarkirin ku şaredariyê bi armanca ku nijadperestiyê nîşan nedê îngilîzî ne nivîsandiye, lê lewhe peyama ku wekî tenê biyanî çopê li erdê bireşînin dide. Herwiha hat destnîşankirin ku kêm kes hene li wê taxê ku bi zimanê îngilîzî nizanibin û ev yek jî wek hewldaneke nijadperestîk hat dîtin. Li ser van bertekan, şaredariya taxa Muswell Hill ya Londonê biryar da ku wan lewheyan rake.

Pêşbaziya şahjinên sergirtî

Li gellek welatên cihanê pêşbaziyên şahjinan tên lidarxistan. Gellek caran jî kesên oldar ji ber cilên vekirî yên beşdaran bertekan nîşan didin.

Pêşbaziya şahjinan ya ku li bajarê Subang yê Endonezyayê li dar dikeve, ji hemû pêşbaziyên din ên cihanê guhertî ye; Jinên beşdarên pêşbaziyê nimêj dikin, quranê dixwînin û cilên girtî li xwe dikin. Bi giştî 137 beşdaran serî li pêşbaziya Şahjina Cihanê ya Misilman da û 19 keçên ciwan mafê beşdarbûnê bidestxistin. Keçên ciwan ji welatên mîna Nîjerya, Bangladeş, Îran û Malezyayê ne. Guhertineke din ya vê pêşbirkê ji yên din jî ew e ku keçên beşdar divê ne tenê bi xweşikbûna xwe, herwiha bi oldarî û zîrektiya xwe jî ji yên din ên beşdar zîrektir bin. Di pêşbirkê de oldarbûna keçên ciwan jî tê testkirin. Keçên ku bi banga melayê sibihê ji xew radibin, destmêj digirin û nimêj dikin, divê piştre jî pirsên derbarê olê de bibersivînin.

Ev pêşbirka cuda cara sêyemîn e ku li heman welatî tê lidarxistin û nêrînên cuda li ser hene. Oldarên tundrew dibêjin ku ev pêşbirk jî jinan vediguhezîne objektan. Lê digel bertekên bi vî rengî jî, ulemayê bilind ê Endonezyayê piştgirî da pêşbirkê.

Rûdaw

Rojnameyeke siyasî û heftane

Xwedî
Rudaw Media GmbH

Sernûser
Ako Mihemed
ako@rudaw.net

Rêvebirê Nivîsînê
Nasredîn Akyol
nesredin@rudaw.net

Dîzayner
Hamdullah Yumlu

Rêveberî û belavkirin
Sabir Yasîn
sabir.yasin@rudaw.net

Şêwirmendê yasayî û aborî
Ayhan Çiftçi

Marketing û reklam
Sabir Yasîn
sabir.yasin@rudaw.net

Navnîşan
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln/Germany

Pêwendî
Telefon: +49 (0) 221-58 87 22 80
Fax: +49 (0) 221-58 87 22 82
info@rudaw.eu
www.rudaw.net / www.rudaw.eu

Belavkirin / Vertrieb:
Axel Springer Vertriebsservice GmbH
Süderstraße 77
20097 Hamburg
www.as-vertriebsservice.de

Rûdaw ji bo nivîsên ku bi nav tên weşandin ne berpirsyar e.

© Hemû maf parastî ne

www.arsivakurd.org

Denis Natali

Eger tenê Duhok, Hewlêr û Silêmanî bin, di wê baweriyê de me ku kêşeya Bexdayê nîne û dibêje herin.

David Romano

Bi rêya wê petrola Herêma Kurdistanê dikare bigihije bazarên cihanê û bêyî ku tevlî boriya petrolê ya sereke ya Iraqê bibe.

Maykil Genter

Di pirsa petrola Kurdistanê de Tirkiye lojîktirîn hevpeyman e.

Rola petrolê di serxwebûna Kurdistanê de

Hewlêr, Washingto (Rûdaw) - Herêma Kurdistanê li ser nexşeya enerjiya cihanê bûye navekî diyar. Bi vê yekê ve girêdayî jî, bi dîtinên nû yên zeviyên petrolê dibe ku ragihandina dewleta kurdî nêzîk bûbe.

Mamosteyê zanîngeha bervedêriya niştimanî ya Amerîkayê, Denîs Natalî, ku gellek nivîs derbarê Kurdan de belav kirine, dibêje: "Dewleteke xwedî serwerî ku li ser asta navxweyî lawaz be, dibe dardestê dewletên derdora xwe. Herêma Kurdistanê weke dewlet reftarê dike û kontrola wê di çarçoveya sînorekî diyarkirî heye, lê ne xwediya ragihandina navdewletî ye."

Natalî ku pirtûka xwe ya dawî li ser Kurdan bi navê "Nîvdewleta Kurdî" nivîsandiye, hebûna petrolê li Herêma Kurdistanê wekî faktoreke xurt ya ji bo ragihandina dewleteke serbixwe ya ku Kurd piştê pê girêbidin nabîne: "Mercên pêkhatina dewleteke serbixwe navendeke lawaz, hesta neteweyî, piştgiriya derve û piştgiriya navdewletî ne û ne petrol in."

Herêma Kurdistanê ji sala 1991ê ve ji Bexdayê cuda bi awayekî serbixwe rêveberiya xwe dike. Nivîskarekî amerîkî yê di warê pirsa kurdî de şareza, rexneyê li awayê rêveberiya Herêma Kurdistanê dike. Bi baweriya wî ev rêveberiya niha li vê herêmê dibe nimûneyeke ne baş ji bo rêvebirina dewletekê.

Maykil Genter nivîskarekî amerîkî ye û li ser Kurdên Bakur û Başûr dinivîse. Wî heta niha çend pirtûk li ser Kurdan nivîsandine û ya dawî jî bi navê "Rabûna Kurdan" e. Genter diyar dike ku herêma Kurdistanê yekîneyeke îdarî ya klasîk ya bi tevayî piştê bi petrolê ve girê dide û pêwistiya wê ji bo bidestxistina serbixwebûnê bêhtir bi petrolê heye.

Herêma Kurdistanê ji sala 2003yê ve dest bi proseya deranîna petrolê kiriye. Niha jî zêdeyî 55 şirketên biyanî ji bo deranîna petrolê li herêma Kurdistanê kar dikin. Hinek ji wan di asta cihanê de şirketên herî mezin yên bi vî karî re mijûl in. Di nav de Exxon Mobil û Total jî, pirraniya bazarên petrola cihanê di destên van şirketan de ne.

Petrola yedeg: 700 milyar bermîl

Li gor statîstîkên wezareta çavkaniyên xwezayî, petrol yedeg li herêma Kurdistanê gihiştiye zêdeyî 50 milyar bermîlan. Ev yek jî bû hokar ku pêgeha aborî û siyasî ya vê herêmê xurt bibe. Bi vê yekê re jî dewletên derdorê niha bi çavekî din li vê herêmê dinêrin. Yek jê Tirkiye ya ku rojane pêwîstiya wê bi 700 hezar bermîl petrol heye û çavê wê lê ye ku bigihije asta dewletên herî li pêş yên cihanê.

Maykil Genter derbarê girîngiya Tirkiye ya ji bo herêma Kurdistanê jî dibêje: "Di pirsa petrola Kurdistanê de Tirkiye lojîktirîn hevpeyman e. Pêwîst e Amerîka jî bo vê babetê werê ser rê. Dibe li gor demê Bexda jî vê qebûl bike."

Lê belê nakokiya herî sereke di navbera Hewlêr û Bexdayê de kêşeya petrolê ye ku Bexda qebûl nake Herêma Kurdistanê petrola xwe bifiroşe. Ew di rewşa herî xirab de jî hevalbendê firotina wê ya bi rêya boriyên petrola niştimanî ye. Lê Hewlêr pêdagiriyê dike ku li gor destûra Iraqê mafê wan yê deranîn û firotina petrolê heye. Van nakokiyan çend caran pirsgirêkên xurt di navbera herdu aliyan de pêk anîn.

Maykil Genter balê dikişîne ser danînberheva hêza leşkerî ya herdu aliyan: "Eger Kurd li dijî Bexdayê şer bikin, dizanim pêşmerge gelekî aza û xurt in. Lê weke Bexdayê çekên wan ên giran nînin. Hêza wan a ezmanî nîne."

Denîs Natalî petrolê tenê bi kêşeya siyasî ve girênade lê belê balê dikişîne ser kêşeya axê: "Kêşeyek heyî dibe aloztir bibe. Petrol dibe tevlî babeta axê bibe. Niha behsa wê yekê dibe ka sînorên Kurdistana serbixwe heta kû derê ne. Eger tenê Duhok, Hewlêr û Silêmanî bin, di wê baweriyê de me ku kêşeya Bexdayê nîne û dibêje herin. Ji ber ew salane 13 milyar Dolar li wan vedigerîne. Lê belê em li ser Kerkûk û Neynovayê axaftinê dikin."

Beramberî vê yekê rojnamevan û pisporê karûbarên Rojhilata Navîn, Davîd Romano, destnîşan dike ku nebûna yasaya petrol û gazê li Iraqê zêdetir dibe hokara ku Kurd bîra ragihandina dewletê bibin: "Eger Bexda di dariştina yasaya petrol û gazê de hinekî nermtir ba û bi awayekî ew daxwazên wê ji aliyê Herêma Kurdistanê ve jî bihata qebûlkirin, hingê rafînerên serbixwe yên li cem Herêma Kurdistanê gelekî lawaztir dibûn. Ev yek bêhtir bi Iraqê ve hatiye girêdan, ji ber Kurdistanê wê pişta xwe bi vê yasaya petrolê ve ji bo misogerkirina dahata siberojê girêbida. Lê têşikandina di danîna yasayeke bi vî rengî bûye sedema ku Kurd hewlê ji bo serxwebûnê bidin."

Sedema piştgiya Tirkiyeyê ji bo Kurdistanê: Petrol

Herêma Kurdistanê niha bi rakêşana boriya petrolê ya ji bo Tirkiyeyê mijûl e û dibe piştî çend kîlometreke din ev proje bi dawî bibe. Wezareta çavkaniyên siruştî jî dibêje "Emê 400 hezar bermîl petrol di rêya vê boriyê re bişînin derve."

Cîgirê serokê zanîngeha Soran û pisporê petrolê, Hawrê Mensûrbeg, ku demekê ligel şîrketa TOTAL a fransî jî kar kiriye, petrolê weke hokareke sereke dibîne ku hişt Tirkiye pêwendiyên xwe yên ligel herêma Kurdistanê serêrast bike: "Tiştê ku hişt Tirkiye piştgiriya Herêma Kurdistanê bike û hikûmeta Herêma Kurdistanê nas bike, petrol e."

Davîd Romano danîna boriya petrolê di navbera herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê de weke pêngaveke giring dibîne: "Boriya petrolê ber bi dawiyê ve tê. Bi rêya wê petrola Herêma Kurdistanê dikare bigihije bazarên cihanê û bêyî ku tevlî boriya petrolê ya sereke ya Iraqê bibe. Bi gotineke din, bêyî ku bikeve bin kontrola Bexdayê de."

Wezîrê çavkaniyên xwezayî li herêma Kurdistanê, Aştî Hewramî, berê ji Rûdawê re diyar kiribû ku Herêma Kurdistanê salane derdora 11 milyar Dolaran ji Bexdayê werdigire lê eger ew bi xwe petrola Kurdistanê bi rêya wê boriyê bifiroşin, rewş wê gelekî were guherîn. Rojane 400 hezar bermîl dikare bi rêya wê boriyê were herikandin. Bi vê yekê 16 trîlyon Dînar dibin qezenca Herêma Kurdistanê."

Plan: Heta sala 2015ê wê yek milyon bermîl

Li gor plan û bernama hikûmeta Herêma Kurdistanê, heta sala 2015ê wê yek milyon bermîl petrol bifiroşe derve. Herwiha heta 2019ê wê ev hejmar bigihe 2 milyon bermîlên petrolê.

Maykil Genter derbarê bandora petrola Herêmê Kurdistanê ya li ser parçeyên din ên Kurdistanê bawer dike ku pêwendiyên Tirkiye wê bi hesanî heta dawiyê ligel Herêma Kurdistanê bi vî şêweyî berdewam neke: "Tirkiye Kurdistaneke serbixwe naxwaze, hez dike Herêma Kurdistanê niha çawa be, wisa bimîne. Ne amade ye bi dewleteke kurdî re tevbigerin, ji ber serxwebûna Kurdistanê dikare ji bo Kurdên li Tirkiyeyê jî bibe modelek."

Genter nebûna destûrekê li Herêma Kurdistanê dixe stûyê PDKê û YNKê: "Destûrek nîne ku dengdan li ser hatibe kirin. Bi awayekî eşkere hêj nakokiyên PDKê û YNKê didomin. Ev yek dikare dewleta serbixwe hilweşîne."

Maykil Genter şîretan li Kurdan dike ku ji bilî petrolê guh bidin çandiniyê jî, da ku bikaribin dewleta kurdî li ser lingan bihêlin: "Kurd tenê pişta xwe bi qezenca petrolê ve girêdidin, çandinî pirr kêm e, ev lawazî ye. Lewma şîreta min li Herêma Kurdistanê ew e ku pirr miqate be, lezê di serxwebûneke nîvço de neke."

Herêma Kurdistanê di aliyê erdnîgarî de bêyî deriyekî avê ye ku bikare wê rasterast bi cihanê ve girêbide. Bi baweriya Davîd Romano, eger Herêma Kurdistanê bixwaze bibe dewleteke serbixwe, divê piştgiriya yek ji cîranên xwe jî misoger bike: "Herêma Kurdistanê nekariye piştgiriya cîranên xwe ji bo ragihandina serxwebûnê misoger bike."

Li gor Maykil Genter jî divê Kurd xwe ji bo guherînên deverê amade bikin: "Herçiqas Kurd ne serbixwe jî bin, divê xwe ji serxwebûnê re amade bikin, ji ber sînor hildiweşin. Heye Iraq jî hilweşe. Bawer dikim hevalbendiya bi Tirkiyeyê re pirr baş dibe."

Lê Natalî di aliyê aborî de ne geşbîn e: "Dilgiraniya min ew e ka hûnê çawa dewleta xwe li ser lingan bihêlin, eger sibe 13 milyar Dolarên we qut bikin? Eger qezencên bi Bexdayê re ji destên we biçin, gelo hesabekî we yê din heye? Ji ber ev pêngaveke wekî ku zarokek dev ji dê û bavê xwe berdê ye."

www.arsivakurd.org

Endamê parlementoya Sûriyê, Şerîf Şehade

Endamê parlementoya Sûriyê, Şerîf Şehade:

Em cudabûna Kurdan ji Sûriyê qebûl nakin

Dilxwaz Behlewî
Hewlêr

Endamekî parlementoya Sûriyê ragihand ku eger Amerîka li Sûriyê bide, wê Herêma Kurdistanê jî bibe armanca wê lêdanê. Herwiha dibêje hikûmeta Sûriyê amade ye di çarçoveya Sûriyê de mafên kultûrî û çandî bide Kurdan.

Piştî mirina çend welatiyên sivîl li navçeya Xote li kêleka Şamê di encama bikaranîna çekên kîmyewî de, ku heta niha rejîma Esed bikaranîna wan çekan înkar dike, egera lêdana rejîma Esed ji aliyê welatên rojava ve bihêztir bûye. Li gor endamê parlementoya Sûriyê, Şerîf Şehade, ku weke kesekî nêzîkî Beşar Esed tê naskirin, serokê Amerîka bi wê biryarê xwest xwe û welatê xwe ji wê qeyranê derbas bike lê berê rastî hatibû, piştî ku wî ragihand ku biryar daye ku li Sûriyê bide.

Şehade got: "Eger kongres bi ser nekeve, wê demê neçar dibe piştgiriya Obama bike, da ku bi awayekî sînordar li Sûriyê bide. Bawer im ev herdu eger jî, kîjan ji wan pêk bê, dibe xaleke reş di dîroka siyasî ya Obama de. Sûriyê ji wê destdirêjiyê natirse û amade ye ji bo bersivdanê. Hokara çavnetirsiya me jî vedigere behaneya wê destdirêjiyê, ku derewa bikaranîna çekên kîmyewî ye."

Her çiqasî Şerîf Şehade dibêje ku şiyana wî nîne ku di rûyê Amerîkayê de derkevin, lê got: "Bi kêmanî em dikarin wê êrişê têk bidin. Di heman demê de Rûsya di aliyê siyasî de hewl dide wê êrişê rawestîne." Wezîrê derve yê Rûsyayê beriya çend rojan ragihand ku Rûsya şer li dijî kesî nake, ev helwest jî wiha hate ravekirin ku Rûsya Sûrî di nîvê rê de bi tenê hiştiye.

Di vî warî de Şerîf Şehade got: "Rûsya mezintirîn piştgira Sûriyê bû di dema borî de. Di siberojê de jî her piştgiriya Sûriyê dike, lê cihê şermezariyê ye ku em li benda wê yekê bin ku leşkerên Rûsyayê berevaniya Sûriyê bikin, ji ber ku gelê Sûriyê dikare berevaniya xwe û axa xwe bike."

Li gor zanyariyan, hikûmeta Sûriyê çekên xwe veguhastine zanîngeh û nexweşxaneyan, da ku Amerîka nikaribe wan bike armanc. Lê Şerîf Şehade dibêje: "Ev dereweke mezin e. Ev propagenda tenê derewên Amerîkayê ne. Bila ji bo her aliyekî zelal be ku artêşa Sûriyê li ser hemû axa welat belav bûye." Şerîf Şehade berê di hevdîtinekê de ragihandibû ku eger lêdana leşkerî li Sûriyê bibe, hingê ewê rê bidin ku Kurd xwe biçek bikin ji bo bervedêriya Sûriyê.

Şerîf Şehade di vî warî de got: "Amanca yekem a lêdana leşkerî Sûrî ye. Amanca duyem jî şikenandina ezmûna Kurdan li Kurdistana Iraqê ye. Gelê kurd birayên me ne û hemû mafên wan parastî ne. Ez wek parlementerekî Sûriyê, beriya derketina krîza Sûriyê min digot Kurd xwedî maf in û divê hemû mafên wan ên siyasî û rewşenbîrî di hemû waran de bi wan bên dan, ji pêvî cudabûna ji Sûriyê."

"Nêrîna Salih Muslim helwesteke lojîk e"

Tevî ku ev parlementer Kurdan xwedî maf dibîne, lê ti carê nabîne ku serxwebûna wan rewa ye û dibêje " hemû mafên Kurdan ên rewşenbîrî, civakî û siyasî hene. Em jî ligel wê yekê ne ku ev maf tev di çarçoveya Sûriyê de werbigirin û ev gav guncaw e cihbicih bibe. Lê gellek eşkere dibêjim, em heval nînin ligel wan ku bangeşeyê ji bo cudabûnê ji deweta Sûriyê bikin. Em li dijî parçekirinê ne ku bi çi awayî be."

Di demekê de ku pirraniya gumanan bi alî ve diçin ku rejîma Sûriyê çekên kîmyewî bikaranîbe, gumana serokê PYDê Salih Muslim ji vê yekê heye û dibêje : "Bikaranîna çekên kîmyewî ne ji berjewendiyên rejîma Sûriyê ye." Şerîf Şehade pesnê vê nêrîna Salih Muslim wek helwesteke lojîk dide û got : "Di demekê de ku artêşa Sûriyê di hemû bereyên şer de ji bo serketina li hemberî terorîstan pêşketin pêkaniye, di heman demê de Kurd beramberî grûpên terorîst li navçeyên Cizîrê roleke niştimanperwer digirin."

Şehade derbarê vê yekê de ku gelo ti pêwendî di navbera hikûmeta Sûriyê û hikûmeta Herêma Kurdistanê de heye, got: "Ez hevaheng im ligel parlementerê kurd di parlementoya Sûriyê de rêzdar Umer Osê bi mebesta cihbicihkirina dozên Kurdan li Sûriyê, li ser bingeha wê yekê ku ew welatiyên sûrî ne û her ji bo vê mebestê jî li ser asta bilind hevahengî ligel hikûmeta Sûriyê heye. Hêvîdar im pêwendiyên me ligel hikûmeta Herêma Kurdistanê jî hebin." Şehade amadebûna xwe jî nîşa da ku serdana Herêma Kurdistanê bike, eger dozdariyek ji bo vê mebestê bigihije destê wî.

Serokê hikûmeta demkî ya opozîsyona Sûriyê, Ehmed Tuhma:

Ezê serdana *Herêma Kurdistanê* bikim

Ehmed Tuhma

Hewlêr (Rûdaw) - Serokê hikûmeta demkî ya opozîsyona Sûriyê Ehmed Tuhma ji Rûdawê rê got ku ew bi xurtî piştgiriya rêkeftina di navbera Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) û Hevpeymaniya Niştimanî ya Sûriyê dikin. Tuhma ragihand ku ewê serdana Herêma Kurdistanê jî bike, ji bo ku ji nêzîk ve rewşa penaberên Rojava bişopîne.

Tuhma diyar kir ku yek ji karên wan yên sereke guhdana herêma Cezîrê ye û pêşkêşkirina alîkariyên mirovane ye. Serokê hikûmeta demkî herwiha tekez kir ku wê ji bo rawestandina koçberiyê gavên jidil bavêjin û da zanîn ku yek ji postên hikûmeta wî wê para Kurdan be. Serokê hikûmeta demkî ya opozîsyona Sûriyê Ehmed Tuhma wiha got: "Kurd hevparê me ne û em bi hev re ji bo dewleteke sivîl, demokratîk û pirralî kar dikin."

Ehmed Tuhma her wiha eşkere kir ku ew deverên Rojavayê Kurdistanê, yên ku di bin destê PYDê de ne, ewê bi diyaloga digel PYDê vê pirsê çareser bikin û ti carî bi wan re şer nakin.

Tuhma di dawiyê de jî da zanîn ku ewê serdana Herêma Kurdistanê bike û ji nêzîk ve rewşa penaberên Rojava bişopîne, lê behsa dema serdana xwe nekir.

ENKS roja 14ê Îlona 2013ê bi fermî tevlî opozîsyona Sûriyê bû. Ehmed Tuhma jî roja 15ê Îlona îsal ji aliyê opozîsyona Sûriyê ve wek serokê hikûmeta demkî ya opozîsyonê li şûna Xesan Hîto hat destnîşankirin.

Abonetiya Rûdaw

Ez dixwazim bo dema

☐ şeş mehan ☐ salekê ☐ vekirî

bibim aboneyê/ya rojnameya Rûdaw.

Rojnameya min heftane bişînin vê navnîşanê

Nav :

Paşnav :

Navnîşan :

Telefon a min :

E-Mail a min :

Buhayê abonetiyê ji vê kontoyê bikşînin;

Hejmara kontoyê :

Şîfreya bankê (BLZ) :

Bank :

Xwediyê kontoyê :

Dem û cîh: ____________

Destnîşan: ____________

Anjî ezê bihayê abonetiyê bişînim ser kontoya Rûdaw ya li jêr û dekontoya wê ji navnîşana Rûdaw re bişînim.

• Bihayê abonetiyê salekê ji bo nav **Almanyayê: 60 Euro**

Ji bo abonetiya derveyî Almanyayê, pêwendî ligel Rûdaw deynin.

Navnîşan
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya
info@rudaw.eu

Abonetî

Hesabê Rûdaw
Bank Deutsche Bank Köln
Konto Nr 2450161
BLZ 37070024

www.arsivakurd.org

Îranê fêrgeheke zimanê kurdî li Îlamê girt

Nasir Bîrotî
Hewlêr

Piştî derbasbûna çend heftiyan bi ser vekirina fêrgeha zimanê kurdî li bajarê Îlamê yê rojhilatê Kurdistanê, polîsên vî bajarî fêrgeh girtin.

Destûra vekirina vê fêrgeha kûrsa zaravayê soranî ji aliyê îdareya irşad a bajarê Îlamê ve hatibû dayin. Lê pişt re polîs dergehê fêrgehê girt.

Li gor madeya 15ê ya destûra Îranê, zimanê fermî li Îranê farisî ye. Lê neteweyên din ên di nav dewleta Îranê de dijîn dikarin li qonaxên cuda bi zimanê xwe bixwînin. Di nava 35 salên desthilata komara islamî de ev made bi awayekî rasteqînî neketiye di pratîkê de.

Digel vê yekê jî çalakvanên sivîl fêrgehên zimanê kurdî vedikin û di vî warî de ya herî çalak fêrgeha Soma ye. Soma bi pirranî li parêzgehên Ûrmiye û Sine kûrsên fêrbûna zimanê kurdî vedike. Li gor agahdariyên berpirsên vê navendê, heta niha zêdeyî 11 hezar kes beşdarî kûrsên wê bûne.

Pirraniya niştecihên parêzgeha Îlam û Kirmaşanê ji mezhebê Şêî ne. Ev hokareke ku hikûmeta Tehranê bi awayekî hestyartir li van herdu parêzgehên rojhilatê Kurdistanê tevdigere. Çalakvan hikûmeta Îranê bi wê yekê tometbar dikin ku naxwaze nasnameya neteweyî li van navçeyan derkeve pêş. Ji ber vê çendê jî rayedarên dewletê destwerdan kirin û deriyê kûrsa zimanê kurdî li Îlamê dan girtin.

Çalakvanê sivîl ê li Îlamê, Mûsa Omîd ji Rûdawê re destnîşan kir ku niştecihên Îlamê bi awayekî berçav pêşwazî li vekirina fêrgeha zimanê kurdî kirine. Bi taybet jin û xwendevanên zanîngehê beşdarî kûrsan bûne.

Ev çalakvanê sivîl diyar dike ku berpirsên hikûmetê li vî bajarî ne di wê baweriyê de bûn ku ev elaqeya mezin wê ji kûrsê re were nîşandan. Lê piştî ku dîtin gellek xelk beşdarî kûrsan dibin, êdî xwastin pêşiya vê yekê bigirin.

Bi baweriya Mûsa Omîd bajarê Îlamê ji navçeyên din ên rojhilatê Kurdistanê bêhtir di bin çavdêriya hêzên asayişê de ye. Li gor çavdêriyê wî ev çend sal in ku hesta neteweyî li nav xelkê vî bajarî pêş ketiye: "Hikûmeta Îranê naxwaze ev hest zêdetir li nav xelkê pêş bikeve."

Ew herwiha rexneyê li serokomarê Îranê yê nû Hesen Rûhanî digire û bi bîr dixe ku wî di dema hilbijartinê de bi 10 xalan sozên mafan dabû: "Rûhanî di dema bangeşeya hilbijartinan de daxuyaniyeke ji 10 xalan belav kir û soza berfirehkirina mafên netewe û olên cuda da. Pirraniya dengên Hesen Rûhanî jî ji van navçeyên ku neteweyên cuda lê dijîn derketin."

Parêzgeha Îlamê dikeve başûrê rojhilatê Kurdistanê. Li gor îstatîstîkên sala 2011ê hejmara şêniyên wê 557 hezar û 799 kes bûn. Pirraniya Kurdên vê herêmê bi zaravayên kelhorî, lekî û lorî diaxivin.

Opozisyona Sûriyê û Kurd

Wladimir van Wilgenburg

Opozisyona Sûriyê razîbûna xwe li ser reşnivîsa peymaneke di navbera ENKSê û Îtîlafa Niştimanî ya Sûrî de nîşan da. Peyman encama guvaşên welatên rojava ye û dibe ku bibe sedema hestyariyeke zêdetir di navbera partiyên kurdî de li Sûriyê.

Di Tebaxa borî de eşkere bû ku ENKS pirsa peymana ligel dijberiya sûrî gengeşe dike. Di wê peymanê de gellek daxwazên Kurdan, ji bilî federalîzmê, hatine tespîtkirin. Dihate çaverêkirin ku ENKS di Gulana îsal de tevlî dijberiya Sûriyê bibe, lê ji ber ku Kurdan dixwestin beriya ketina Esed behsa mafên wan bê kirin, neçû serî. Ji ber ku wiha dihate zanîn ku Esed wê bikeve.

Ew peyman dibe ku di encama wan bendewariyan de be ku li welatên rojava hene û tê gotin rojava wê êrişî artêşa Esed bike, piştî ku di 21ê Tebaxê de çekên kîmyewî li dijî welatiyên xwe bikaranî. Amerîka û Ewropa jî fişaran li Ereb û Kurdan dikin, da ku li hev bikin. Opozisyonê Kurd weke netewe nas kirin û peyva erebî jî ji navê komara Sûriyê avêt, herwiha ENKSê jî dev ji daxwaza federaliyê berda.

Ev tiştekî naguhere. Ji ber ku Obama bi Rûsyayê re li hev kir ku rejîma Esed ji çekên kîmyewî bêpar bihêle û nikaribû kongrêsa welatê xwe qayîl bike, ka çima dixwaze li Esed bide. Di encama vê rewşê de jî, Esed li ser desthilatê dimîne û dijberiya ku li Stembolê rûniştiye jî, her lawaz dimîne.

Di vê navberê de PYD planên xwe ji bo pêkanîna hikûmeteke demkî berdewam dike, da ku hilbijartinan saz bike û destûrekê li navçeyên kurdî re deyne ku li jêr destê wê ne. Herwiha YPG, ku hêza çekdarî ya PYDê ye, şerê xwe li dijî al-Qaîde û Artêşa Azad a Sûriyê didomîne.

Tekane rê ji bo girtina rê li ber hestyariyên zêdetir di navbera aliyên kurdî de jî ew e ku Kurd li jêr sîwana DBKê de tevlî dijberiyê bibin.

Berê PYDê hewl da ku partiyên kurdî yên endamên ENKSê neçar bike ku serdestiya PYDê li ser projeya otonomiyê qebûl bikin û bikevin danûstandinan de ligel partiyên din, ku Barzanî pişta wan digire. Lê ENKS tevlî dijberiya Sûriyê bû û hinek partiyên endamên ENKSê ji aliyê Talebanî ve tên piştevanîkirin.

PYD ya ku hemû tişt li ser erdê kontrol kiriye û ji ber girtina sînoran ji aliyê Tirkiyeyê û PDKê ve lawaz nebûye, herwiha ji ber ku PYDê qebûl nekir ku rê bide wê hêza eskerî ku ji aliyê PDKê ve hatiye amadekirin, da ku derbasî Sûriyê bibe, lewma ENKS nikare tiştekî li deverên kurdî yên Sûriyê bike û bi bandor be ji bo dijberiya Sûriyê.

Dijberiya Sûriyê ya li Stembolê rûniştî jî, ji ber ku tiştek li Sûriyê di destê wê de tine, lewma nikare xudan bandor be û al-Qaîde jî roj bi roj bihêztir dibe. Lewma dibe ku bandora peymana Kurdan û opozisyona Sûriyê ew be ku di nav aliyên kurdî de nakokî û hestyariyên zêdetir derkevin holê, weke çawa heftiya borî hate dîtin ku endamên partiyên siyasî ji aliyê asayişa PYDê li Efrînê hatin girtin, bi tometa ku plan danîne ku êrişî YPGê bikin.

Di demekê de ku opozisyona Sûriyê bêhtir ber bi welatên rojava ve diçe, PYD ber bi Rûsyayê ve diçe. Tekane rê ji bo girtina rê li ber hestyariyên zêdetir di navbera aliyên kurdî de jî ew e ku Kurd li jêr sîwana Desteya Bilind ya Kurdî (DBK) de tevlî dijberiyê bibin û dijberî jî li hikûmeta demkî ya PYDê mikur were. Lê ne xuyaye ku evê rû bide, ji ber ku partiyên kurdî li Sûriyê xudan berjewendiyên cuda ne.

CÎVÎNA AGAHDARÎYÊ LÎ SER ROJAVAYA KURDÎSTANÊ

22.09.2013

Yekşem, Saet: 14:00 – 17:00 h

Tagungszentrum Münzenbergsaal
Franz-Mehring-Platz 1 10243 Berlin
S-Bahn Ost-Bahnhof

Axaftvanên Civînê:
- Siyamend Haco - Şepela Pêşeroj ya Kurdî li Sûrî, Berpirsîyarê Ewrûpa
- Dr. Kamiran Darwish - Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûrî (ENKS) - Berlin
- Prof. Dr. Ferhad Îbrahîm - (Uni -Erfurt)

Amedkar:
KOMKAR

Li bajarê Bottropê pêşangeha pirtûkan

- Dersa zimanê kurdî
- Pirtûkên bi wêne ji bo biçûkan
- Pirtûkên çîrokan ji bo zarok, ciwan, dê û bavan

Bername

- Danasîna pirtûka wî ya nû "Tevgera Şêx Seîd – Bi Gotina Şahidan" - Seyîdxan Kurij (Nivîskar)
- Xwendina çîrokan - A. Ulumaskan (Mamoste/Nivîskar)
- Danasîna pirtûkên dersa kurdî

Cîh: SPIELRAUM
Prosperstr. 71,
46236 Bottrop
Dem: 22.09.2013
Seet: 11:00 – 19:00

Amadekar:
Cîvata Dostaniya Elam û Kurdan
YMK Ewropa
Tel: 02041-7827068
0176 103 429 07

www

www.rudaw.eu

Her roj, 24 saetan mijar û hejmarên berê yên Çapa Ewropa ya Rûdawê bixwîne.

Bitikîn!

www.arsivakurd.org

Penaberên kurd li Yewnanê

“Pêşeroja zarokên me winda bûye”

Zinar Ala

Pirraniya penaberên kurd ku bi rêya Yewnanê gihiştine welatên din yên Ewropayê, gellek zor û zehmetî kişandine, gellek jî hêj li wir asê mane û di nav mercên pirr xirab de dijîn. Li Yewnanê ferq nake eger mirov li hundirê navendên hewandina penaberan girtî be, yan jî li derveyî wan “azad” be, di herdu rewşan de penaber êş û keseran dikişînin. Azadî û Behzad du ji wan penaberan e ku li ser rêya Ewropayê li Yewnanê asê mane û ezmûneke tehl li wî welatî jiyane ku ewê zû bi zû ji bîr nekin.

Ciwanê kurd yê bi navê Azadî li navendeke hewandina penaberan li Yewnanê dijî, ya rast ji jiyanê bêtir li wir dimîne. Navend li nêzîkî bajarê Corinto ye, ew berê wargeheke leşkerî bû, niha jî ji bo hewandina 1000 penaberan tê bikaranîn. Li gorî gellek rêxistinên penaberan, penaxwaz di mercên ne mirovane de dijîn, xizmeta tenduristî jî nabînin û pêrgî danûstandineke xerab ji aliyê polîsan ve tên. Li gorî mercên Yekîtiya Ewropayê, pêkan e ku penaber heya salek û nîvê jî girtî bimîne.

Azadî (21) di Tebaxa sala borî de ji Rojavayê Kurdistanê gihiştibû Yewnanê. Lavakirinên bavê wî û mirina hevalekî wî hîştin ku ev ji Sûriyê derkeve. Bêyî ku bikaribe serî li mafê penaberiyê bide, ew ji ber pasporteke sexte hate destgîrkirin û piştî du mehan ji mabûna wî li qereqolan, ew birin navenda hewandina penaberan li Cornito. Ev bûn du meh ku Azadî ji wê navendê serbest bûye, ew dibêje ku mercên jiyanê di wê navendê de gellekî xerabtir in ji mercên jiyanê li zindanên Sûriyê. Tiştê ku hatibû serê Azadî di vê navendê de, ji aliyê rêxistina Amnesty International ve hatibû dokumentekirin. Carekê Azadî dîmen tomar dikirin ku çawa polîs penaberan diçewisînin. Dema polîsek wî dibîne, yekser polîs li dora wî kom dibin, milê wî badidin, hustiyê wî digirin û ber bi dîwêr ve dehf dikin, heya ku nikare bihna xwe bistîne û jê pirs dikin “ji ber çi te vîdyo tomar dikir, ma tu rojnamevan î?” piştre polîs bi pehînan li sîng û rûyê wî didin. Ciwanê kurd derbarê vê ezmûna bi kul de dibêje: “Min li ber xwe neda, min xwe ji dest wan filitand û min serê xwe li dîwêr dixist. Dema min xwest ku ez xwe li eynikekê bixim, wan bi min girt û êrişa xwe rawestandin”.

Digel giliyên rêxistinên mafên mirovan, ti lêpirsîn derbarê êrişa li dijî Azadî de nehat kirin, kesên êrişkar jî ji bo du heftan ji navendê dûr ketin, lê piştre vegeriyan û ketin rikê Azadî. Mafê serdanan lê qedexe kirin û ew xistin bin fişara derûnî de. Digel ku hikûmetê biryar dabû ku hemû penaberên sûrî serbest bêne berdan, lê tenê Azadî di zindanê de mabû û jêre gotin “em te qet bernadin”. Azadî tekez dike ku wî ev hevok ji devê berpirsyarê sereke yê navendê Vassilios Stavropulos bihîstibû.

Hevjîna Behzad

Behzad

Kurên Behzad

Kurekî Behzad di nav konteynera gemarê de li xwarinê digere.

Penaberan bêyî xizmeta tenduristî dihêlin

Di vê navendê de xizmeta tenduristî nayê pêşkêşkirin. Penaberê afganî Mihemed Hesen bo 11 mehan li wê navendê bû, digel ku wî gellek caran arîkarî ji bo nexweşiya xwe xwestibû, lê ew herdem dihat piştguhkirin. Tenê beriya mirina wî bi mehekê ew birin nexweşxaneyê, ew jî ji ber protestokirina penaberên navendê, lê êdî dereng bû, Mihemed di 27ê Tîrmeha borî de jiyana xwe ji dest dabû. Azadî jî dibêje ku wî ti derman ji bo birînên xwe yên ji ber êrişa polîsan ne standibû. Careke din jî ji ber ava xirab kevirek di gurçika wî de çêbû û piştî 15 rojên ji lavakirinê ew birin nexweşxaneyê, lê tenê mîlek (fitîl) dane wî.

Ji ber ku di navendê de gellek hewldanên xwekuştinê çêdibin, berpirsyar mecbûr man ku darên di nav kampê de bibirrin û boriyan jî jêkbiin, da ku penaber ji jor de xwe neavêjin xwarê. Azadî, ku niha serbest e û tenê dixwaze “ji vî welatê gû” derkeve û biçe Almanya yan jî Holendayê, ji bo ku dêbav û sê xuşkên xwe jî bîne wir, ew hê jî di şevan de xewnan dibîne ku ew hêj li Corinto ye.

Ji nav gemarê nan û xwarinê derdixînin

Rewşa penaberên ku li derveyê navendên hewandinê dijîn jî ne baştir e. Di vê bareyê de jî dokumenterekî bi navê “Dojeha Penaberan li Yewnanê” hatiye amade kirin û tê de behsa jiyana pirr dijwar ya penaberan li vî welatî ewropî tê kirin. Di dokumenter de kordînatora rêxistina penaberan ya Migreurop, Sara Prestianni, dibêje: “Yewnan her tişî dike, ji bo ku penaberan nerihet bike, da ku ji Yewnanê birevin, Ewropa jî bi bêdengî tiştan dişopîne û biryarên Yewnanê jî dipejirîne.” Prestianni dibêje ku wergirtina mafê penaberiyê li Yewnanê tê wateya “razana li kolanan, jiyana di nav mercên xerab de, nebûna sîstema hewandinê û xizmeta tendûristî”. Dokumenter çîrokên xemgîn yên çend penaberan vedibêje. Behzad Nasredîn yê ji Rojavayê Kurdistanê yek ji wan penaberan e. Ew ligel hevjîn û sê zarokên xwe li ser caddeyê di bin çadirekê de dijî. Behzad bi rûyekî xemgîn ji kamerayê re dibêje: “Pêşeroja zarokên me winda bûye, ew nan û xwarinê ji nav gemarê derdixînin û ji me re tînin û em jiyana xwe pê dikin.” Ew hewl dikin ku biçin Ewropayê, lê polîs wan digire, zarokê 12 salî jî digirî. Ev zêdeyî 15 caran e ku malbat hewl dide ku ji Yewnanê derkeve, lê polîs wan digire û li wan dixin: “Dilê me bi xwîn e, dengê qîrîna zarokên me tê, ez nikarim herim wan xilas bikim. Polîs li vir dîktatorî ne, ez nikarim tiştekî bikim”.

Ji bo temaşekirina dokumenter: www.vimeo.com/40870904

"Em malbateke piçekî guhertî ne"

Behiya Uca ji du saliya xwe ve li Almanyayê dijî û bi eslê xwe ji Batmana Bakurê Kurdistanê ye. Ew ji sala 2011ê ve di navê partiya Die Linke (Partiya Çep) endama şaredariya Celle ye. Malbata wê malbateke polîtîzebûyî ye û xwişka wê Feleknas Uca deh salan endama parlementoya Ewropayê bû. Behiya Uca ji bo hilbijartinên giştî yên Almanyayê yên 22ê vê mehê berbijêra rêza 7. ya herêma Celle ya partiya Die Linke ye.

Rûdaw: Rêzdar Uca, bala we ya li ser siyasetê ji kû derê peyda bûye?

Behiya Uca: Bala min herdemî li ser siyasetê hebû, bi taybetî ji ber ez li dijî neheqî û newekheviyê me. Ez Kurdeke êzdî me û ji ber vê çendê jî dizanim ku hê jî li vî welatî pirsgirêkên esilbiyaniyan hene. Armanca min ji ber vê sedemê jî ew e ku bêhtir wekhevî biafire.

Hûn ji kengî ve di nava siyasetê de çalak in?

Ez di sala 2009ê de bûm endama Die Linke û di payîza 2011ê de bûm endama şaredariya bajarê Celle. Ji wê demê ve siyaset bûye beşê herî mezin yê jiyana min.

Di xebatên we yên siyasî de tiştên herî zêde kêfa we jê re tê çi ye?

Têkilîdanînên mirovên ku pirsgirêkên wan hene, anjî fikreke ku guherandina tiştên heyî pêk bîne. Dema mirov li rêbazên çareseriya pirgirêkan digere û wê pêk tîne, hesteke kalecaniyê dide min.

Zarokeke we jî heye, gelo hûn bi zehmetiyên hevdengîkirina malbat û siyasetê re rû bi rû dimînin?

Ya min kar, malbat û siyaset e. Zehmet e, ji ber karê xwebexşî yê ez li herêmê dikim jî gellek wextê min digire. Ev ji bo hevrêyên min jî derbas dibe. Bêguman zehmet e ku kesên ji derveyî meselê bizanibin ka çiqas wext ji bo amadekariyan, guftûgoyên aliyên partiyan û di nava komisyonên meclisa şaredariyê de derbas dibe.

Hûn çendîn xwişk endamên Die Linke ne û birayê we endamê FDPê ye. Ev yek bandoreke çawa li hemahengiya malbatê dike?

Em malbateke piçekî guhertî ne. Xwişka min Feleknas bi navê Die Linke 10 salan parlementeriya Parlemana Ewropayê kir. Divê ez li xwe mikur werim ku min xebata wê ya li wir ji dûr ve dişopand. Ji beriya du salan ve, bi min re, birayê min Rêzan Uca jî bi navê FDPê ji bo meclisa şaredariyê hate hilbijartin. Bêguman di gellek babetan de dîtinên me ji hev cihê ne. Lê ev yek bandorê li têkiliyên me nake. Ji xwe baweriya min jî ew e ku divê mirov van herdu tiştan ji hev cuda bike.

Çima bila mirov dengên xwe bidin Behiya Uca û partiya Die Linke?

Die Linke tena partî ye ku berjewendiyên welatiyên ku hatina wan kêm e diparêze. Em dixwazin kêmaniya seeta kar ji 10 Euroyan destpêbike. Em li dijî teqawîtiya di temenê 67 salî de ne. Em herwiha li dijî beşdarbûna Almanyayê ya di şerên li welatên din û firotina çekan in. Mirov dikare ji bernameya me ya hilbijartinê gellek xalên din jî rêz bike…Lê çima bila dengên xwe bidin min? Ez di wê baweriyê de me ku divê meclisa fedaral ya Almanyayê nûnertiya hemû beşên civakê bike û heta niha nûnertiya hinek beşên civakê kêm bû. Ez herwiha dixwazim ku li wir berjewendiyên "kesên ji rêzê" û mirovên esilbiyanî jî werin parastin.

Hevpeyvîn:
Agit Boztemur

Berendamên kurd jî tevlî hilbijartinan dibin

Bêrîvan Aymaz

Koln (Rûdaw) - Di hilbijartinên giştî yên Almanyayê yên 22ê Îlonê de bi giştî 4500 berendam têdikoşin. Di nava berendaman de gellek kesên esilbiyanî jî hene. Hejmarek ji van berendaman kesên Kurd.

Bêrîvan Aymaz

Bêrîvan Aymaz yek ji wan siyasetvanên kurd e ku di hilbijartinên giştî yên Almanyayê de li bajarê Kolnê berendam e. Aymaz di sala 1972yê de li herêma Çewliga Bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê. Ew di 6 saliya xwe de bi malbata xwe re hatiye Almanyayê û ji wê demê ve nişteciha bajarê Kolnê ye. Bêrîvan Aymaz digel karên civakî yên wekî wergêriyê, niha li zanîngeha Duisburg-Essenê beşa zanistên siyasî dixwîne. Ji hêla din ve ew ji sala 2009ê ve endama Partiya Keskan e (Die Grunen) û niha jî berendama wê partiyê ye.

Bêrîvan Aymaz giringiyeke taybet dide beşdariya koçberan û bi taybetî jî Kurdên li Almanyayê ya hilbijartinan: "Hemû kesên li Almanyayê dijîn parçeyekî civaka vî welatê ne û li vira dijîn. Ji ber vê sedemê girîng e ku ew jî beşdarî guherînên siyasî yên Almanyayê bibin." Aymaz herwiha diyar dike ku beşdarbûna hilbijartinan ji bo jiyana di nava demokrasiyê de girîng e. Ew herwiha dide zanîn ku eger ew were hilbijartin, ewê di parlamena Almanyayê de xebatên ji bo çareseriya meseleya kurdî jî bike.

Ayten Kaplan

Ayten Kaplan

Ayten Kaplan di sala 1970ê de hatiye dinyayê û beşa pedagojiya pîşeyî xwendiye. Ew di sala 1998ê de bi endametiya di partiya PDS de tevlî siyaseta alman bû. Piştî guhertina navê partiya wê, ku bû Die Linke (Partiya Çep), endambûna wê dîsa dewam kir. Ayten Kaplan bi taybetî bi xebatên xwe yên di nav Yekîtiya Komelên Kurd li Almanyayê (YEK-KOM) tê naskirin. Wê di navbera salên 1999 û 2009ê de di nava birêveberiya YEK-KOMê de cih girt. Ji bilî vê yekê, wê di nava birêveberiya gellek sazî û komêleyên Kurdan de jî cih girtiye. Kaplan ji bo hilbijartinên giştî yên Almanyayê di nava lîsteya Partiya Çep ya eyaleta Nordrhein-Westfalen de cih digire.

Hamîde Akbayir

Hamîde Akbayir di sala 1959ê de hatiye dinê û ji hêla pîşeyî ve asîstena teknîka kîmyayê ye. Akbayir kevneparlementera parlementoya eyaleta Nordrhein-Westfalen e û niha jî namzeta partiya Die Linke ya bajarê Kolnê ye.

Alî Atalan

Alî Atalan namzetê partiya Die Linke yê bajarê Coesfeldê ye. Ew berê jî wekî parlementerê partiya xwe yê eyaleta Nordrhein-Westfalen hatibû hilbijartin, lê belê di hilbijartinên heman eyaletê yên dawî de partiya wî benda hilbijartinê derbas nekiribû û ji ber wê em ji parlementoyê derketibû.

Serdar Agit Boztemur

Serdar Agit Boztemur 24 salî ye û namzetê Die Linke yê bajarê Velbert li eyaleta Nordrhein-Westfalen ye. Boztemûr niha li zanîngeha Dusseldorfê beşa ragihandin, siyaset û civaknasiyê dixwîne. Ew herwiha di ber xwendina xwe re wekî rojnameger jî dixebite.

Deşnê Murad ji Rûdawê re:

Ezê çiyayê Sefîn paqij bikim

Meha borî Deşnê Murad ligel çend hunermendên din ên amerîkî û ewropî beşdarî mezintirîn festîvala muzîka cihanî bû ku li paytexta Libnan Beyrûdê hate sazkirin.

Rûdaw: Beşdariya te di vê festîvalê de çawa çêbû?
Deşnê: Demeke dirêj e ku li ser ekranên kanalên libnanî strana "Open Your Eyes" (Çavên Xwe Veke) dihate weşandin û gellek kesan bi rêya vê stranê ez nas kirim. Lewma ji aliyê radyoya NRJ-muzîk ve hatim vexwendin, da ku ligel çend hunermendên cihanî tevî wê festîvalê bibim. Ev xewneke min a mezin bû ku hate cih, ango ez stranan bi hunermendên cihanî re bêjim.

Bandora wê festîvalê li ser nasandina te çêbû?
Beriya her tiştî divê ez dilê cemawer xweş bikim. Dema min tenê 5 xulek bûn. Di wê demê de min karîbû bêjim Kurdistan welatekî dûr ji şîdet û terorê ye, welateke ku ji Libnanê hez dike û Libnan jî ji Kurdistanê hez dike. Vê heftiyê min di malpera INSTAGRAM de postek belav kir, da ku her kes zanibe ku em mînakeke azad in li Rojhilata Navîn.

Piştî wê festîvalê doz li te nehatiye kirin ku tu beşdarî festîval û konsêrtên din bibî?
Ji ber ku niha demsala festîvalan xelas bûye, vêga ti çalakiyeke wiha nîne, lê ji bo demsala bê em li benda festîvalên mezin in li Ewropayê.

Destpêka derketina te bi saya awazdaner Helkewt Zahir bû, lê niha tu pê re kar nakî, çima?
Min karibû li cem Helkewt Zahir bi pêş bikevim û li Kurdistanê weke hunermend bême naskirin. Lê niha hewl didim li ser piyên xwe bisekinim û ev dora du salan e serbixwe me û tenê kar dikim. Niha weke her kesekî pêwendiyeke me ya normal heye, lê pêwendiyên me yên hunerî nîn in.

Beriya demekê te wêneyekî xwe yê bêyî makyaj li ser Facebookê belav kir. Çima te wisa kir?
Min hez kir ku vî wêneyî pêşanî wan kesan bidim ku digotin Deşnê bes bi makyaj û fotoshop xwe derdixîne. Min jî got eger hûn dixwazin min bêyî makyaj bibînin, fermo ev ez im, bêyî makyaj û fotoshop.

Di nav hunermendên Kurdistanê de gellek pirsgirêk hene û pêwendiyên wan lawaz in. Pêwendiyên te bi hunermendan re çawa ne?
Kêşeya min bi ti hunermendî re nîne. Lê pêwendiya min bi gellekan ji wan re nîne. Hez dikim ku tev alîkarê hev bin. Herwiha karê baş û nû bi hev re pêk bînin. Niha pêwendiyeke min a gellekî baş ligel hunermendê pirr xoşewîst Karwam Kamil heye.

Projeyên te yê nû çi ne?
Niha ligel çend hunermendên holendî mijûlî amadekirina CDyekî me, bi tevayî stranên îngilîzî ne. Herwiha çend bandoreke kurdî tê de ye ji aliyê melodî û deng ve. Lê bi awayekî ku ewropî jî qebûl bikin û li cem wan ne tiştekî biyanî be. Bi piştgiriya Xwedayê mezin piştî serê salê belav dibe. Ji pêvî wê jî, ligel rêxistina jinan ya bi navê Wayn, ku çend jinên xwedî bawernameyên bilind in, em diçine ser çiyayê Sefîn û pak dikin.

Hevpeyvîn:
Evîn Selah Hewlêr

Deşnê Murad

- *Sala 1986ê li Silêmaniyê ji dayik bû.*
- *Sala 1997ê ligel malbata xwe hat Holendayê.*
- *Di temenê 16 salî de ligel grûpeke semayê kar kiriye.*
- *Dema 2 salan bûye nimayişkara cilûbergan*
- *Li Kurdistan TV amadekar û pêşkêşkara bernameya "Bê Kontrol" bû.*
- *Piştre bi rêya bernameya "Deşnê Show" û "Korek Star" a kanala Korek TV derbasî nav karê ragihandinê bû.*
- *Niha li KurdistanTV pêşkêşkara bernameya "Şepolekanî jiyan" e.*

Nilûfer Akbal albûmeke klasîkên kurdî derdixîne

Seyîdxan Kurij

Nilûfer Akbal vê mehê bi navê "Klasîkên Kurdî" albûmeke nû derdixîne. Albûm wê bi soranî, kurmancî û kirmanckî be û ji 15 stranên klasîk yên kurdî pêk tê.

Nilûfer Akbal derheqê albûma xwe de ji Rûdawê re got: "Ew xebat wek xebateke arşîvî ye. Pirraniya stranan berê hatine gotin, lê min ew ji nû ve şirove kirin û ji nû ve aranje kirin, ew bûn wek stranên nû. Em dixwazin klasîkên kurdî ji bo nifşen nû bidin nasandin û heskirin."

Albûma Nilûfer Akbal "Klasîkên Kurdî" ji aliyê NAM Muzik&Produktion hatiye amade kirin.

Nilûfer Akbal li navçeyê Mûşê Gimgimê hatiye dinyayê, ew di hemû albûmên xwe de stranên kurmancî, soranî û kirmanckî distre.



www.alshaqurd.org

Dilşad Mihemed Seîd:

“Elektrîk û tiştên din ji mûzîkê girîngtir in”

Muzîkjen û awazdanerê kurd Dilşad Mihemed Seîd yek ji muzîkvanên navdar ên Kurdistan û Rojhilata Navîn e. Di destpêka salên heştêyan de Koma Mûzîkê ya Dihokê damezrand, herwiha ligel çend muzîkvanên biyanî yên navdar kar kiriye. Niha li Awisturyayê niştecî ye û weke muzîkvanên amûra kemanê endamê komeke sînfonî ya Awisturyayê ye. Dilşad Mihemed Seîd niha bi serdanekê li Herêma Kurdistanê ye û mijûlî klîpkirina parçeyekî muzîkê ye, ku Rûdaw sponsoriya wî parçeyî dike.

Rûdaw: Ew parçeyê muzîkê ku hûn klîpa wê dikişînin, navê wê çi ye, yê kê ye?
Dilşad Mihemed: Ev parçeya muzîkê yek e ji wan 24 kaprîskên muzîkjenê navdar yê îtalî Paganînî. Ev muzîk di sala 1830 de hatiye nivîsandin, yekemîn karê Paganînî bû. Helbet parçeyên muzîkê yên navborî di warê teknîkî de pirr dijwar in, nemaze bo amûra kemanê.

Weke ku we behs kir, ev parçeyê muzîkê ku we klîpa wê kişandiye, li Rojhilata Navîn tenê 5 kes dikarin bijenin. Ligel wê yekê jî tiliyên Paganînî ne weke yên mirovekî normal bûn, lewma hûn dibêjin ku lêxistina wê dijwar e?
Rast e, tiliyên wî pirr dirêj bûn, lewma dixwest ji 10 tiliyan zêdetir jî lê bide, ku niha ti mirovek nikare hewldaneke wiha biceribîne jî. Hinek dengo jî hene, dibêjin ku wî navbera tiliyên xwe bi kêrê birîbû, da ku zêdetir û baştir li muzîkê bide. Lewma pirr dijwar e û demeke dirêj jî dixwaze heta mirov bi başî kontrol bike. Yekemîn car ligel profesorê xwe fêrî wê parçeya muzîkê bûm, li Londonê di sala 1984ê de, ku wê demê ez xwendekar bûm, lê min berdewam nekir. Di Nîsana îsal de min li ser kar kir û zêdeyî mehekê li ser xebitîm û min dûre tomar kir. Lê karên Paganînî ne hêsan in. Min jî her ewqasî karîbû li ser kar bikim, dibe ku ev parçeya muzîkê ji bo guhdarekî normal zehmet be, ji ber ku pirr cuda ye ji muzîkên din.

Ev demeke ku me berhemên we yên taybet nedîtine. Ti berhema nû li ber dest heye?
Min qet karê xwe kêm nekiriye, lê belê gellek karan dikim. Lê kêm derdixim. Ji ber ku bêhtir waneyên mûzîkê didim û bi karê orkestra û sînfoniyan mijûl dibim. Her hez nakim tiştekî bilez bikim. Min ji sala 1995ê ve tenê yek albûma mûzîkê belav kiriye. Lê heta niha nebûye du. Niha du berhemên din li ber dest in, ku bo yekem car radigihînim. Yeke ji wan bi navê Pêşmerge ye û ya duyem jî bi navê Şingal e. Em bi niyaz in ligel sînfonyayekê tomar bikin ku teksta wê Edîb Çelkî nivîsandiye û di vê demê de bidawî dibe.

Çima te Rûdaw hilbijart, da ku klîpê ji bo vî parçeyê mûzîkê amade bike?
Ku min bihîst Rûdaw kalîteyeke wê ya gellekî baş heye û studyoyên wê nû ne, herwiha li Kurdistanê take TV ye ku bi sîstema HD kar dike, min hez kir ku kar ligel wê bikim.

Tê gotin ku ji aliyê grûpeke yewnanî ya navdar ve doz li we bûye ku hûn bibin endamê wan. Ev rast e?
Yekser ji aliyê serokê grûpê ve nehatime dozkirin. Lê belê çend mûzîkjenên hevalên min ji vê grûpê doz li min kirin. Lê bi sedema ku gellekî mijûl im, min got nikarim. Lewma neçûm nav grûpê. Ez pirr kêfxweş dibûm eger ji vê grûpê min soloya mûzîka kurdî pêşkêş kiriba, ne ku bibim endamekî ji vê grûpê.

Hûn Tîpa Mûzîka Duhokê ya berê û ya niha çawa dibînin?
Duhok ji aliyê hunerî ve pêşketî ye. Lê hest dikim ku li gor bajarên din ên Kurdistanê, ji aliyê mûzîkî ve, li cih maye û li dû bajarên din e.

Hûn bi niyaz bûn ku akademiyeke mûzîkê li Duhokê vekirin. Çi bi vê projeyê hat?
Rawestiya ye.

Çima?
Ez bi xwe jî dipirsim çima? Destpêkê me gav in baş avêtin, wek wergirtina rêdanê, herwiha terxankirina zeviyê li Duhokê ku niha ev zevî her maye. Min her tişt bi dawî kir. Ev nexşe û planê ku min danîne, eger cîbicî bibin, sibe ez têm Kurdistanê. Lê aliyên pêwendîdar ji min re gotin niha av, elektrîk û tiştên din girîngtir in ji mûzîkê. Ez jî dizanim ku ev girîng in, lê niha rola kultûrê jî girîng e.

Hevpeyvîn:
Hîwa Selah Xeyrî

Kees Schaepman, yek ji rojnamevanên destpêkê ku piştî kîmyabaranê gihiştibûn Helebçeyê:

Dîtina laşê pisîkekê gellekî bandor li min kir

Goristana cangoriyên Helebçeyê

Kees Shaepman

Piştî kîmyabarana Helebçeyê ji aliyê rejîma Baasê ve, çend rojnamenivîsan karîbûn bi rêya kamereyên xwe û bi nivîsên xwe çîroka vê karesatê ji cihanê re vebêjin. Kees Schaepman yek ji wan rojnamenivîsan bû ku bi kamereya xwe karîbû hejmarekê ji wêneyên qurbaniyên vê tawanê ji bo cihana rojava veguhêze û çend danûstandinên zindî jî ligel bijîşk û birîndarên vê karesatê kirin. Herwiha hejmarek ji gotaran jî derbarê wê de nivîsandin.

Kees di sala 1946ê de li bajarê Den Haagê hatiye dinyayê. Sala 1976ê ew bû servivîserê rojnameya Hollend a serbixwe. Piştre bû servivîserê belavokeke mehane ya ingilîzî bi navê “Translation”. Ji pêvî wê, bû rêveberê kolêja ragihandinê û radyoya v.p.r.o. Kees hejmarek raport li ser Helebçeyê ji bo radyoya holendî amade kirin. Hêviya wî bû ku careke din serdana Helebçeyê bike.

Destên Kees dilerizîn. Porê wî yê spî. Dengê wî jî dilerizî dema ku çîrokên ser Helebçeyê digotin. Dema min serdana wî kir, ew li xaniyekî biçûk, li bajarê Amsterdamê dijiya. Kamere û tayp, mîkrofen û rekordên xwe anîn û got "Li bin zemînê bûn. Bibe ji bo Helebçeyê, bila piştî mirina min nebin lîstika destê zarokan."

Rûdaw: Piştî kîmyabarana Helebçeyê hûn yek bûn ji wan rojnamenivîsên ku di cih de gihiştin vî bajarî. Çawa bû?

Kees: Sala 1988ê piştî kîmyabaranê li Helebçeyê bûm. Demeke dirêj min ji balyozxaneyê doza vîzaya Îranê kiribû. Lê her nedane min. Sibehekê zû bû, ji balyozxaneya Îranê pêwendî bi min re bû. Gotin eger tu vîzayê dixwazî em amade ne bidin te. Ez jî bi kêfxweşî ji bo vîzayê çûm. Her wê êvarê jî gihîştime Tehranê. Hingê hêj cenga Îraq – Îran berdewam bû. Piştre ji Tehranê bi hêlîkopterê gihiştim Helebçeyê. Lê beriya wê, her li Tehranê, min çend birîndarên vê karesatê dîtin, ji nêzîk ve jî min danûstandin bi wan re kir.

Di hêlîkopterê de çend rojnamenivîs û wênegirên din ligel min bûn, ku ser CBS bûn. Ji bilî ku hejmarek ji leşkerên îranî jî tê de bûn. Dema gihîştim Helebçeyê, hêj laşên qurbaniyan li nav kolan û rêyên vî bajarî bûn. Hest dikim ku Îranê ji ber wê ev vîza daye min, da ku medya guh bide karesata Helebçeyê. Beriya wê pêwendiyên baş ên Saddam bi welatên rojava re hebûn. Karesata Helebçeyê ji aliyê welatên rojava ve rastî eleqeyeke mezin nehat. Tew ku niha dibêjim ez di dema cenga Îraqê de li wir bûm. Xelk dibêjin mebesta te cenga Îraqê ligel Amerîkayê? Nizanin ku beriya wê cengeke mezintir hebû, ku bêhtir ji milyonek kes tê de hatin kuştin.

Tiştekî din ku pirr bala min kişand ew bû ku eşkere Saddam Huseyn çekên kîmyewî bikaranîbûn. Lê ligel vê jî, Neteweyên Yekgirtî nedihiştin ku li ser wê bê dadgehkirin. Bi rastî gellek caran ez li ser vî tiştî dilteng dibûm. Çiqas demjimêran jî rûniştim û min gotar li ser vê babetê nivîsandin.

Derbarê doza Helebçeyê de roleke wî ya mezin hebû, gellek ji wan nihêniyan hê jî eşkere nebûne. Hêj bi awayekî zanistî lêkolîn nebûye. Piştî rijandina wê gaza kujer, bêyî arîkariya ti alî û bêyî ti serperiştiya zanistî, ew xelk teva ji sînoran vegeriyan Helebçeyê. Di demekê de ku welatên rojava tevan bêdengî hilbijartibû. Ev nîşan dide ku amadebûna rojnamenivîsan li cihê bûyeran çiqasî girîng e.

> **Sala 1988ê hemû hêstirên min çikandin û karîbûm negirîm. Lê dîmena 2010ê ez giriyandim û hêstir ji çavên min hatin xwarê.**

Te got ku cihana rojava guh neda vê karesatê. Di nêrîna we de, medyaya rojava guh da Helebçeyê?

Medya guh dayê. Lê bi giştî, gellek dem çû heta ku xelkê bi tevayî fêm kirin ku çi li Helebçeyê bûye. Yekem pirtûka baş li ser vê babetê Joost Hilterman nivîsand, ku bi zanistî zelal kiribû ku çi celebê çekên kîmyewî bikarhatibûn, çawa bikarhatibûn. Herwiha rola Iraq û Îranê çi bû. Lê ev pirtûk sala 2007ê derket, ku em dikarin bêjin dereng bû. Me hest dikir ku rojava guhdana baş nade Helebçeyê. Ev jî vedigeriya bo pêwendiyên Saddam ligel rojava. Ji tevaya Holendayê tenê du peyamnêr çûne Helebçeyê. Tevî ku ev berhevkirineke seyr e, lê ji bo lîstikeke topa pê gellek ji vê hejmarê bêhtir diçin.

Hemû ev tiştên li ser Helebçeyê nivîsandî ji heman jêderê hatine. Ji ber ku peyamnêr û medyakar li wir kêm bûn. Yekem û girîngtirîn rêxistin ku behsa çekên kîmyewî kir bijîşkên bêsînor bûn. Ewên din tev bê deng bûn. Bijîşkên bêsînor yekem rêxistin bû ku ji rojava gihişte Helebçeyê. Piştre konferansa rojnamevanî lidarxistin.

Ewa ku li Helebçeyê derket, tiştekî bi carekê re dilêş bû. Rast e, Îngilîzan jî berê çekên kîmyewî bikaranîn. Herwiha di cenga cihanî ya yekem de hatin bikarnîn. Lê ew li dijî hêzên çekdar bûn, ne ku xelkên sivîl û bêtawan.

Ligel vê jî dikarim bêjim ku guhdaneke kêmtir bi Enfalan hate dan. Kêmtir jî behsa wan hate kirin, di demekê de ku bêhtir ji 100 hezar kes bûne qurbanî û bêyî zêdebûn dikarim bêjim ev jenosîd yan hewldan bû ji bo jenosîdê.

Hestên we çawa bû dema hûn gihiştin Helebçeyê û we ew laş dîtin?

Min bi xwe berê jî cengên din dîtibûn. Lê ne ku bajarekî tije mirî. Dema li nav bajêr geriyam, tiştekî ku gellekî bandor li min kir bû. Ew jî dîtina laşê pisîkekê bû. Dibe seyr be li cem te. Lê bi rastî matmayî mam û min got eger mirov karibe tiştekî bike, êdî çi tawana lawir heye.

Piştî ewqas sal we 2010ê dîsa serdana Helebçeyê kir. Yekem tişt ku hestê we gur kir çi bû?

Tê bîra min ku sala 1988ê çûme Helebçeyê, min gotarek nivîsand û got "Careke din zarok li vî bajarî nalîzin". Lê ku 2010ê min serdana Helebçeyê kir, yekem tiştê ku min dît hejmarek ji zarokan bû ku dilîstin. Sala 1988ê hemû hêstirên min çikandin û karîbûm negirîm. Lê dîmena 2010ê ez giriyandim û hêstir ji çavên min hatin xwarê. Ji ber ku min hêvî û hezkirin li Helebçeyê dît.

Helebçe yek ji wan bajar e ku herdem di bîra min de dimîne. Tew keça min jî bi nexweşiya derûnî ket, bi sedema dîtina wêneyên Helebçeyê. Hêvîdar im karibim cereke din jî Helebçeyê bibînim.

Hevpeyvîn: ***Kanî Helebçeyî Amsterdam***

Reklam
BERTAX - CONSULTANT
Unternehmensberatungsgesellschaft mbH

Mihasebeya we di destên ewle de!
Mihesebeya Malî
Finanzbuchhaltung
Mihesebeya Karkeran
Lohnbuchhaltung
Office-Essen
Zeche Katharina 2
45307 Essen
Tel.: 0201/8933950
Fax: 0201/8933951
Mobil: 0177/3147213
E-Mail:
info@bertax-consultant.de
Office-Dortmund
Geschwister-Scholl-Str. 26
44135 Dortmund
Tel.: 0231/15044-510
Fax: 0231/15044-115

Hausarzt M.D. (Rus.)
Serdar Mustafa
Facharzt für Allgemeinmedizin
Sprechzeiten:

Mo	Di	Mi	Do	Fr	Sa
8-12	8-12	8-12	8-12	8-12	8-12
15-18	15-18		15-18	15-18	

Krimstraße 2. 44145 Dortmund
Tel. 0231 / 81 85 47 • Fax 81 80 74
Mobil 0171 / 27 00 550

Kamîran Darouich
Zahnarzt
Seestr. 43
13353 Berlin
Tel.: 030 - 453 80 96
Fax: 030 - 817 02 297
Öffnungszeiten
Mo. - Di. - Do.: 09.00 - 18.00 Uhr
Mi. - Fr.:09.00 - 15.00 Uhr
Sa.: Nachvereinbarung
Reklam

www.arsivakurd.org

“Bila xelk herdu çavên min derxînin“

Serokê Lîsteya Perîşan û Hejaran, Celal Perêşan, tekane berendam e ku wî û endamên lîsteya wî ti poster li kolanên bajarên Başûrê Kurdistanê ne daliqandine. Celal Perêşan xwediyê kanaleke sporê ye û bi bawerî dibêje ewê bigihije parlementoyê. Wî soz jî daye ku li her taxekê ji bo dema 3 mehan ofîsekê veke.

Rûdaw: Ti posterên we nînin, çima?
Celal Perêşan: Naxwazim jîngehê bilewitînim. Niha jî sîkotîna posterên du hilbijartinên borî bi dar û dîwaran ve mane û şarevaniyê nikarîbû wan paqij bike.

Hûn jî dikarin li gor şîretên komisyonê posteran daliqînin û jîngehê jî nelewitînin.
Ev 20 roj in min kanaleke sporê vekiriye, heta niha 80 hezar kesan lê temaşe kiriye, ev besî min e.

Ewên ku li kanala we temaşe dikin, wê dengên xwe bidin we?
Bi piştrastî dibêjim, ewên ku li kanalên sporê dinêrin, ji sedî 90ê wan wê deng bidin lîsteay me.

Hûn çawa vê yekê dizanin?
Dilê min wiha dibêje.

Hûnê bi dilê pak herin parlemento, yan bi dengan?
Deng û dil hevdu temam dikin, eger dilê te ne pak be, tu nikarî dengan bînî.

Hûn giraniyê didin çi celebê dengdêran?
Di serî de taxa min a hejaran, taxa Mentikawe, ji ber ku di 20 salên borî de bi wan re rabûme û rûniştime, kêşeya elektrîkê hebû min ji wan re çareser kir, lawên wan jin anîne min daweta wan saz kiriye. Di mewlûdên wan de min li defê daye, li mizgeftê min ji wan re bang daye. Hin kes li taxa me hene ku ser bi aliyên din in, lê dibêjin emê dengên xwe bidin te. Ji sedî 75ê xelkê taxa min wê dengên xwe bidin min.

Hûnê bi taxekê bikevin parlementoyê?
Ne tenê taxa min, kesên din jî wê deng bidin min. Rojane bi sedan kes pêwendiyê bi min re dikin, bêyî ku wan nas bikim, dibêjin ji ber pakbûn û rastgotina te emê dengên xwe bidin te.

Baş e, pakbûn û rastgotin bes in bo parlementoyê, yan divê hûn serbixwe û bi ciger bî?
Eger bigihijim parlementoyê, piştrast be ku serokê parlementoyê wê pembû bixe guhên xwe de û wê bibêje rica dikim vê belayê bavêjin derve. Ji ber ku pirr bêj im û 24 demjimêran devê min nakeve hev de û di xew de jî dipeyvim.

Ji bo bidestanîna mafên xelkê axaftin têr dike?
Erê, bes e, ji ber ku îro dinya dinyaya axaftinê ye, dinyaya gihandina peyaman e. Gellek kesên ku dikevin parlementoyê xwe ji xelkê cuda dikin. Lê ez herim, yan na, gava demjimêr 2 dewama min li parlementoyê xelas bû, ez diçim kanala xwe û dibêjim lêdanek gula yekem ji bo Cristiano Ronaldo.

Ango hûn parlementoyê weke karmendî dibînin?
Min sond xwariye, eger ez herim parlamentoyê, li her taxekê sê mehan ofîsekê vedikim.

> **Eger bigihijim parlementoyê, piştrast be ku serokê parlementoyê wê pembû bixe guhên xwe de û wê bibêje rica dikim vê belayê bavêjin derve.**

Ev ne propagandaya hilbijartinê ye gelo, ev soz wê li bîra we bimînin?
Eger min ev soz ji bîr kirin, bila xelk herdu çavên min derxînin.

Hûn dibêjin hûn serbixwe ne, ji kû hûn serbixwe ne?
Ez bi serbilindî dibêjim serbixwe me. Eger ne serbixwe bûma, ezê biketama lîsteya PDKê.

Lê ji ber ku hûn ne di lîsteya PDKê de yî, lewma hûn serbixwe ne?
Ez di kar û fikirîna xwe de serbixwe me.

Dibêjin we 50 milyon Dînar ji PDKê wergirtine?
Bi Xwedê, xaniyekî dayika min hebû, mîrat e, rêza min ji bo xwişk û birayên min heye ku doza mîratê nekirin. Ez û bavekî pîr di wî xanî de dijiyan, min xanî bi 130 hezar Dolaran firot. Min 65 hezar Dolar dan amûrên kanala xwe û niha kar dike. Min 50 milyon dînar jî dane komisyonê. Eger min Dînarek jî ji kesekî wergirtibe, bila bê guhê min bikişîne û bêje ka pereyên min.

Beriya ku hûn bên vê bernameyê, berpirsekî PDKê li ser vê bernameyê pê re axivî û jê re got negire. Ev çi serbixweyî ye?
Pêwendiya min ligel pirraniya berpirsên PDKê heye û xwe wek xizmetkarê mala Barzanî dibînim. Kêşeya min ligel berpirsên PDKê heye, li jêr mala Barzanî.

Lê ji aliyê berpirsekî din ve jî doz li we bû ku hûn poşman bibin, rast e?
Gellek kesan ji min re gotin. Tew polîtburoya PDKê jî doz li min kirin ku dev ji vê lîsteyê berdim.

Bi çi mercî hûn bi gotina PDKê dikin û dev ji vê lîsteyê berdidin?
Eger ji bo hilbijartina encûmena parêzgehan yek bim ji berendamên PDKê, ez dev ji vê lîsteyê berdidim. Beriya 2 salan soz dane min, lê soza xwe nebirin serî. Eger ez ji lîsteya PDKê bûma, min ev lîste ranedigihand.

Hûn wiha nabînin ku we ziyan kiriye û 50 milyon Dînarên we diçin?
Bi qurbana te bin. Pere li cem min ne pirsgirêk bûn.

Hûn gellekî gellekî partî bû?
Ez derwêş im. Ez dibêjim mela me, di jiyana xwe de min partîzanî nekiriye. Ez mela me.

Êdî kanî serxwebûna te?
Gellek melayên weke min rûniştine û serbixwe kar dikin.

Çi bi we bû ku ewqasî hûn ji partî dûr bikevin?
Hemû malên Barzaniyan rêzdariya min dikin. Barzanî ji min re dibêje tu hunermendê pêşmerge ye. Eger li ser lîsteya PDKê hatibama kandîdkirin, tenê ji Barzaniyan min 40-50 hezar deng dianî.

Êdî mala Barzanî hûn di lîsteyê de dananîn?
Wan na. Kesin hene li xwarê. Yek Barzanî di lîsteya PDKê de nîne. Mala Barzanî min wek kurê xwe dibînin. Kêşeya min ligel hinek ji berpirsên PDKê ye ku li xwarê ne. Bi taybetî ew kesên ku ragihandina PDKê birêvedibin. Ez 7 salan ji nav PDKê rawestandim. Rêzdariya min ji bo biraderan heye, gellek caran digotin me tu rawestandî. Min jî digot sîle li min dan. Ez dilsozê PDKê bûm, lewma hatim dûrxistin.

Kesê ku dilsozê PDKê be tê dûrxistin?
Erê. Bi taybetî jî ewê ku dilsozê mala Barzanî ye.

Dibêjin Celal Perîşan û 7 pîşe.
Erê. Lê kak Nêçîrvan carekê gotibû ew sifir ji bîr çûye, 70 pîşeyên te hene.

Baş e, yek ji pîşeyên we bangdan e. Lê hûn diçin mizgefteke pirr dûr ji mala xwe.
Ew mizgefteke vala ye. Bangderên wê kêm in. Kes ji te re nabêjî çima tu hatî.

Ji aliyê mizgefta mala we kes ji we re dibêje çima hûn hatine?
Carekê min bang da, piştre min bihîstibû ku gotibûn ev qeşmer çawa dibe bang bide?

Di nêrîna we de hûn xwediyê televizyonekê bana baştir bû, yan bêjer?
Na bi Xwedê, xwediyê televizyonê. Ji ber ku berê ku bêjer bûm her dihatim derxistin. 11 caran ji ragihandina PDKê hatime dûrxistin.

Niha hûn xelkê derdixînin?
Na bi Xwedê, kesî dernaxînim. Ji ber ku kesekî min nîne. Bi xwe 11 karmendên min hene.

We çend mirovên xwe li televizyona xwe danîne?
2 biraziyên min û 2 kurên kak Salar Celal û ewên din jî tev bi xwebexşî kar dikin.

Hûn di televizyona xwe de reklamê ji bo xwe dikin?
Ez çaverêyî 10 rojên dawî yê propagandaya hilbijartinan im ku 24 demjimêran wêneya xwe deynim.

Lê 4 berandamên din?
Ew di axaftinê de hêmin in. Ez bêhtir axaftinê dikim. Ji ber ku ez gellekî dibêjim.
Salar Celal jî hêmin e?
Erê. Ew her carê dibêje bi Xwedê ev ne karê me ye, çima te em anîne nav vî karî?

Êdî te ew bi zorê anîne?
Ez cirnexweş im. Ewqasî min zordarî li wan kir. Lewma ez jî hînî cirnexweşiyê bûme.

Hûn digihijin parlementoyê?
Ez bawer im ku emê kursiyekî bînin. Asayî ye eger kursiyekî lingê wî şikestî be. Lê em tînin.

Mûçeyê we li PDKê maye?
Erê. Ez karmendê televizyona Zagros im. Her mehê mûçeyê min ji min re dişînin, ligel kartekê bi 10 hezar dînarî.

Hûn dewam nakin û mûçe wergirî?
Ne heram e. Min ji mela pirsî. Min got mamoste ez dixwazim kar bikim, lê nahêlin.

Hevpeyvîn: ***Hîwa Cemal***

Têbînî: *Van rojan serokê Lîsteya Perîşan û Hejaran, Celal Perêşan, bi daxuyaniyeke fermî ragihand ku ew xwe ji hilbijartinên parlementoya Kurdistanê (21.09.2013) vedikişîne û tevlî hilbijartinan nabe.*

www.arsivakurd.org

Lehengên zirtan

Selahattin Çelik

Bi rawestandina vekişîna çekdarên PKKê, tirs çêbû ku wê gerîlla û artêşa tirk careke din hev bînin qaqa reş. Tirs bêbinî derket. Ji ber ku şandeya BDPê dew û delingên xwe ji zû ve ji bo serdana Îmraliyê pêçabû. Hikûmet jî gellek aram e, ji xwe û Îmraliyê hewqas bawer e ku pêvajoyê bêtirs û bi gavên kîsoyê birêvedibe. Em êdî hînî vê lîstika yekdevî bûne; çi be jî, wê Ocalan hikûmetê neşikîne, PKK jî Ocalan û wê şano bimeşe...

Pirsek: Li ser pêvajoyê bandora MÎTê eşkere ye. Bi têkiliyên canûcan xinamîtiyeke wisa çêbûye, ku hima hima “welatparêzên pêvajoyê” navê Hikmet Fidan bidin zarokên xwe. Eger bûyer ev e, hûn çawa bi îdiayên derew û çewt, kes û organên kurd ên rûmetdar bi têkiliya MÎTê tawanbar dikin? Ewilî rixa li ser ziman û dilê xwe bişon.

Xwepêşandanênzimanê zikmakî

Di pirsa kurd de mifte ziman e. Êdî ker û gêj jî dizanin ku dewlet zimanê me nade me. Û eger em vî mafî bi dest nexin, emê çem bi çem herin. Bi xebata xwe em bi kevçiyan didin hev, dewlet bi pişaftinê bi bêran belav dike.

Ev deh sal in ku ji bo zimanê kurdî kampanya tên lidarxistin, ji fêrgeh û komele heya rojname, televîzyon, malper, pirtûk û yên din, xebateke pêwîst û girîng heye. Lê qet têrê nake. Di bûyerê de qelsiya mezin ev e: Yên sazker ne bi însyatîfa xwe û bi rewş û xwestinên gel, lê bi telîmatan gavan diavêjin. Ji wê yekê berdewamiya xebat û bertekan nayê û weke ronahiya mûmê ditefinin.

Hin pêşniyar: Bila yên kurdî nizanibin, êdî ji BDPê nebin parlementer û şaredar. Bila parlementer, şaredar û rêvebirên dezgehan ewilî zarokên xwe bişînin fêrgehên kurdî. Hingê lê binêrin, ka kurdî çawa tê axaftin û pêş ve diçe. Divê xwediyên telîmatan û fermanberên wan baş bizanibin, ku mirov ewilî di mejî de dibe Kurd.

Û di ser de jî, BDP çawa dikare bi fermana ji jorê, ambargoyê li ser rojnameyeke kurdî ya herî xweşbîn deyne? Ka hişmendiya demokrasî û azadiya derbirînê? Fedî bikin, fedî!

Siberoja kongreya neteweyî

Derbarê lidarxistina kongreya neteweyî de şikdarî zêde dibe. Em xwe bispêrin biwêja “hêvî herî dawî dimire”. Bi vê heviyê, ez bendewariyên sereke careke din têbînî dikim: Divê PKK dev ji çavbirçîtî û xweferzkirinê berde; divê li partî û komên din ne weke pariyên xwarînê û navgînên emilandinê, lê weke hevalbend û hevkarên mayînde û rûmetdar binêre. Divê PDK û YNK bi hişmendiyeke navxweyî fêm bikin ku kongre ji bo hemû Kurdistanê dicive. Divê hemû amadekar û beşdarên kongreyê hestyariya xwe ji bo mafên mirovan nîşan bidin û di vê bareyê de ji bo saziyeke biryardar a hevpar amade bin. Divê ji dewletên serdest bêtirs bikaribin pirsa neteweyî ya hevpar bikin bername. Divê ji bo xebat û tekoşîneke hevpar û dirêj amade bibin. Eger aktorên kongreyê ji bo van erkên pîroz ne amade bin, bila beredayî li mehneyan negerin.

Em bi kevçiyan didin hev, dewlet bi pişaftinê bi bêran belav dike.

Hilbijartinên Başûr

Li Başûr ezmûna demokrasiyê kurt e. Dîsa jî û tevî hin pevçûn û bûyerên kuştinê jî, tişta dibe serkeftinek e û ji bo welatên Rojhilata Navîn mînakeke başiyê ye. Ji ber ku ji bîrdoziyên olî heya yên komûnîst, partî bi awayekî azad propagandaya xwe dikin û dikevin hilbijartinê. Pîrozbahî ji wan re. Daxwaz û hêvî ev e ku partiyên Başûrî ji berjewendî û nakokiyên deverî dûr bikevin, li ser rastiyên civakî tevbigerin û herwiha di çareserkirina kêşeyan de demokrasiyê bikin feraseta navxweyî.

Tiştekî din: PKK (PÇDK) jî bi awayekî azad dikeve hilbijartinan û dibe ku ji hikûmetê, ji pereyên terxankirî alîkariyê jî distîne. Hêjahî pesndanê ye. Lê gelo di cihê PDKê de PKK bûya, wê heman xweşbînî nîşan bida? Gava mirov xirecira KCKê ya li ser nûnertiya kongreya neteweyî û bûyerên Rojava li ber çav digire, mirov qet optîmîst nabe.

Li Tirkiyeyê dozên kontergerîlla

Li Amedê ev du-sê sal in ku doza JÎTEMa Cizîra Botan dimeşe. Efser Cemal Temizöz, hin binefser, aşarte-kujer û cerdevan tên darizandin. Vê nijdeyê li herêma Cizîra Botan-Sîlopî-Herzex-Şirnexê bi dehan welatparêz revandibûn, kuştibûn û termên wan avêtibûn bîr û sergoyan.

Li Amedê doza Musa Anter hêj nû destpêkiriye. Tilîkeşê bûyerê Hamit Yildirimê Şirnexî û yek-du efserên JÎTEMê girtî ne. Li Elezîzê doza Ayten Oztûrk, Metin Can û Hasan Kaya bi lêkolîn û lêpirsiyariyê berdewan dike.

Ji bo karsaz, parêzer û bûrokratên kurd yên di serdema 1993-1995ê de li Stembol û Enqerê hatibûn kuştin, doz hatiye vekirin. Karsaz Behçet Canturk, Feyzi Aslan, Şahin Aslan, Savaş Buldan, Haci Karay û Adnan Yıldirim, parêzer Medet Serhat, Yusuf Ekinci û Faîk Candan, ajovan Îsmail Karalioglu û Recep Kapucu, bûrokrat Mecit Baskin û Namik Erdogan, ji Kurdên Rojhilatî Askar Simko û Lazen Esmaeli (ku ew bi MÎTê re xwedî têkiliyan bûn), hemû ji aliyê Koma Taybet ve hatibûn kuştin.

Ew kom payiza 1993yê di civîna MGKê (Konseya Ewleyiya Neteweyî) de hatibû damezrandin. Di civînê de serokkomar Suleyman Demirel, serokwezîr Tansu Çiller, sererkan Dogan Gureş amade bûn. Serokê komê Mehmet Agar û cîgirê wî Korkut Eken û Îbrahîm Şahîn bûn. Di komê de MHPyî, mafya, polîsên tîmên taybet û parlementer-sercerdevan Edîp Sedat Bucak û yên din hebûn.

Di van dozan hemûyan de navê zilamê JÎTEM û MÎTê Mahmut Yildirim (Kesk) derdikeve pêş. Ev kes ji binemaliya xwe kurd e. Çi sosret e ku dewlet nikarê wî bigire, an jî qedere wî eşkere bike!

Doza Besbîn/Silopiyê di rê de ye: 14.06.1993yê, heft gundî ji aliyê leşkeran ve hatibûn revandin û kuştin. Termên wan hêj nehatine dîtin. Generalê Lîwaya Şirnexê Mete Sayar fermana komkujiyê dabû. 27.03.1994ê gundên Bêsûkê û Gewerê (Şirnex) ji aliye du balafirên şer ên tirk ve hatibûn bombekirin û 38 gundiyan bi awayekî hov jiyana xwe ji dest dabûn. Di herdu bûyeran de, ji ber ku berpirsiyar rasterast artêş e, astengiyên mezin hene, lê dîsa jî amadekariyên dozvekirinê hene.

Hikûmeta AKPê bi niqandina hin bûyeran û ji bo her bûyerê girtin û darizandina sê-çar kesan, dixwaze dewletê ji tohmeta komkujî û kuştinên kujernediyar bişoyê û rûspî derîne. Ji bo pêvajoya îro hişyarî: AKP li gorî xwestina xwe dozan vedike, dimeşîne û dawî li wan tîne. Bi vê yekê peyamê dide û dibêje “her tiştê bi pirsa Kurd ve têkildar, tenê di bin kontrola min de dimeşe”. Rexne li siyaset û çapemeniyê kurd; çima van dozan têr naşopînin û derbarê wan de raya giştî hestyar nakin?

Kî xayîn e?

Wladimir van Wilgenburg

Di hilbijartinên Kurdistanê de dîrok bi roleke giring radibe. YNK behsa wê yekê dike ku çawa pêşmergeyên wê xebat kirine heta serkeftinê, PDK jî guhdanê bi dîrokê dike.

Di bersivê de, Lîsteya Goran PDK bi wê yekê tometbar dike ku di 31ê Tebaxê de xayîntî kiriye. Ev jî hewldaneke ji bo lawazkirina YNKê û PDKê. Lê pirsyar ew e ku çima ewqasî guhdan bi dîrokê tê kirin? Gelo dîrokeke hemû partiyan a şerê li dijî hevdu nîne?

Siyasetvanên Lîsteya Goran berê bi xwe beşek bûn ji YNK, lê ew niha bûne opozisyon li dijî “gendeliya” PDKê û YNKê. Newşîrwan Mistefa bi peymana stratejîk di navbera PDKê û YNKê de razî nebû, lewma jî Goran ava kir.

Weke bersivdana wê helmeta ku PDKê û YNKê destpêkirine û tê de dîroka xwe ya xebatê li dijî rejîma Baasê beloq dikin, Lîsteya Goran dest bi helmeteke berevajî kir û hewl dide dîroka PDKê û YNKê eybdar bike, nemaze jî dîroka PDKê.

Rola hemû partiyên kurdî di “xayîntîkirinê” de hebû û dergehên paş ên malên xwe ji welatên cîran re vekirine, da ku berjewendiyên xwe yên siyasî biparêzin.

Goran bi taybetî behsa bîranîna 31ê Tebaxa 1996ê kir, ku wê demê Mesûd Barzanî tankên Saddam Huseyn di şerê navxwe de li dijî YNK bikaranîn. Lê qey ji bîra Goran çûye, yan xwe kerr dike, ku YNKê jî di rojên 26 û 27.07.1996ê de rê da artêşa Pasdaran ku êrişî ser penaberên Kurdên Îranê û PDK-Î bike. Herwiha Talebanî jî di sala 1996ê de êrişeke leşkerî, bi hevkariya artêşa Îranê, bir ser Barzanî. Berpirsên Goran jî rola wan di şerê navxwe de hebû. Herwiha PKK jî, ku niha bi navê PÇDK tevlî hilbijartinên Herêma Kurdistanê dibe, berê di şerên navxweyî de li Iraq û Tirkiyeyê beşdar bûye.

Pirraniya partiyên kurdî di nav dinyaya siyaseta kurdî de şerê hevdu kirine, ev jî encama parçebûna Kurdistanê bû ku wiha kir ku her partî bibe xwediyê berjewendiyên xwe yên navçeyî û taybet. Weke mînak dijminê sereke yê PKKê Tirkiye ye, lê PDK dixwaze bi rêya Tirkiyeyê serxwebûna xwe ji Bexdayê werbigire. Herwiha şerê li ser desthilatê di navbera lîderên kurd de wiha dike ku bêhtir parçe bibin û li dijî hevdu şer bikin.

Rola Îslamiyan jî di şerê navxweyî de hebû û li dijî partiyên kurdî şer kirin. Helbet Yekgirtû tevlî vê yekê nebû û ji sala 1994ê ve guh dane siyaseta bi şêwazên sivîl. Ligel vê yekê jî, ew rastî nayê veşartin ku Yekgirtû girêdayî Îxwan Muslimîn e, ku pirr caran helwestên dijminkar li hember nasyonalîstên kurd nîşan dane. Vê dawiyê jî grûpeke ser bi Îxwan li Sûriyê li dijî Kurdan şer dike, da ku nehêlin bigihijin otonomiyê.

Ev nîşan dide ku rola hemû partiyên kurdî di “xayîntîkirinê” de hebû û dergehên paş ên malên xwe ji welatên cîran re vekirine, da ku berjewendiyên xwe yên siyasî biparêzin.

Lewma pêwist e partiyên desthilatdar û opozisyon jî guh bidin aboriyeke çêtir, bikaranîna petrolê di siyasetê de, nebûna xizmetguzariyan, gendelî, xerabiya sîstema tendirustî û nebûna perwerdeyê, ne ku her û her li dîrokê vegerin.

Giring e armanc ew be ku behsa destkeftên xwe yên herî dawî bikin, yan behsa şikestinên rikaberên xwe yên dawî bikin, ne ku her behsa dîrok û xebata pêşmergeyan bikin.

www.arsivakurd.org

Tirkiyeyê yekemîn moleta kirrîna gaza Kurdistanê da şîrketekê

Hewlêr (Rûdaw) - Heftiya borî hikûmeta tirk yekemîn moleta kirrîna gaza Herêma Kurdistanê da şîrketa Siyah Kalem a tirkî, da ku gaza xwezayî ji Herêma Kurdistanê bişîne Tirkiyeyê.

Berpirsên tirk ragihandin ku wan molet dane wê şîrketê, da ku heta dema 26 salan gaza xwezayî ji Herêma Kurdistanê bikirre û bişîne Tirkiyeyê. Biryar e proseya şandina petrolê bi rêya wê şîrketê, ku bingeha wê ya sereke li Stembolê ye, ji sala bê ve (2014) destpêbike.

Li gor wê plana ku şîrketa Siyah Kalem daniye ber destê berpirsên tirk, şîrket ji sala 2014ê ve tibaba 700 milyon metreyên kûbîk yên gazê dişîne Tirkiyeyê û armanca wê jî ew e ku heta sala 2033yê wê rêjeyê bilind bike û bike 3.2 milyar metreyên kûbîk di her salekê de.

Ev pêngav pêwendiyên Enqere û Hewlêrê dibe asteke pirr stratejîk, nemaze ku pêwistiya Herêma Kurdistanê bi deriyekî heye ji bo şandina derve ya enerjiyê bo bazarên cihanê û Tirkiye jî rastî kêşeya kêmbûna enerjiyê hatiye, ew jî di encama geşbûna bilez a aboriya wê di van çend salên dawî de. Tirkiye di bikaranîna gaza xwezayî de gihiştiye asteke wiha ku şûna Brîtanyayê bigire, ku di pileya sêyem de ye li ser astê Yekîtiya Ewropayê.

Bernameya “xwecihîkirina” sektora petrola Kurdistanê

90 % hêza kar dibe navxweyî



Umer Ehmed
Hewlêr

Li gor anketeke wezareta samanên xwezayî, hêza kar a navxweyî di pîşesaziya petrolê ya Herêma Kurdistanê de heta sala 2017ê digihije rêjeya ji sedî 90. Ev jî li gor bernameyeke navxweyîkirina hêza kar a wê sêktorê ye, ku di sala 2011ê de destpêkiriye.

Pîşesaziya petrolê yek ji pîşesaziyên pêşkeftî yên cihanê ye û tenê çend şîrketên navneteweyî yên naskirî xwedî şarezayî û teknolojiyaya pêwist in ji bo pêşxistina zeviyên gaz û petrolê.

Di aliyê dîrokî de, ji destpêka karê şîrketên navneteweyî li welatên xwedî petrol, ji ber nebûna şareza û pisporên wî warî, tenê stafên biyanî di wan şîrketan de kar dikirin. Lê bi dirêjiya karkirina wan şîrketan, li pirraniya welatan weke merc li ser şîrketan hate ferzkirin ku divê şarezayiya di teknolojiya deranîn û dîtina petrol û gazê de bê veguhastin bo wan welatên xwedî petrol û dest bi fêrkirin û perwerdekirina stafê navxweyî di vî warî de bê kirin.

Li Herêma Kurdistanê jî, piştî pesendkirina yasaya gaz û petrolê di sala 2007ê de ji aliyê parlementoya Kurdistanê, hejmareke zêde ya şîrketên navneteweyî yên petrolê hatin Herêma Kurdistanê û niha bi lêgerîn û dîtina petrolê mijûl in.

Weke her welatekî din, ku di destpêka geşbûna pîşesaziya petrolê de ye, pirraniya staf û şareza û endezyarên petrolê li Herêma Kurdistanê biyanî bûn, ji bilî beşên jêr yên weke ewlekarî û veguhastin û xizmetguzariyên seretayî yên weke dabînkirina pêdivî û xwarina karmendan, ku hêza kar a navxweyî bûn.

Wezareta samanên xwezayî di sala 2011ê de dest bi bernameya “xwecihîkirina” sektora petrolê ya Herêma Kurdistanê kir. Mebesta vê bernameyê veguhastina pisporiya giranbuha ya wî warî ye ji kesên biyanî yên bi ezmûn ji bo staf û endezyarên navxweyî.

Encamên wê bernameyê di qezenca şîrketan û Herêma Kurdistanê de ye jî, ku dibe hokara pêşxistina hevkariyeke avaker di navbera xwediyê kar weke hikûmeta Herêma Kurdistanê ji aliyekî û şîrketan ji aliyekî din ve.

10 hezar hes di pîşesaziya petrolê de kar dikin

Li gor anketeke wezareta samanên xwezayî, bi giştî niha 10 hezar kes di warê pîşesaziya petrolê ya Herêma Kurdistanê de kar dikin ku 7200 kes ji wan welatiyên Herêma Kurdistanê ne û 2800 kesên şareza û pisporên biyanî jî li zeviyên cuda cuda kar dikin.

Li beşê serdest yê petrolê, ku pêk tê ji lêgerîn û dîtin û kolandina bîrên petrolê, ji ber xwezaya kar derfetên kêm ji bo karmendên navxweyî peyda dibin û di vî beşî de 3 hezar kes kar dikin, ku 2200 ji wan navxweyî ne û 800 jî pisporên biyanî ne.

Lê di beşê jêrîn yê sêktora petrolê de, ku parizandin, berhemanîn û kargehên petro-kîmya li xwe digire, derfetên kar ên zêde tên peydakirin û niha dora 7 hezar kesan tê de kar dikin ku 5 hezar ji wan navxweyî ne û du hezar jî biyanî ne.

Bernameya navxweyîkirina sektora petrola Herêma Kurdistanê bi rahênanê destpêdike û dibe hokara kontrolkirina hatina kesên biyanî bo Herêma Kurdistanê û di demeke ne pir dirêj de bi kêmanî pisporên asta jêrîn yên sêktora petrolê êdî dibin kesên navxweyî. Di encamê de ev yek jî dibe sedem ku şîrketên cihanî yên petrolê ku li Herêma Kurdistanê kar dikin jî sûdmend bibin, ji ber ku destê kar yê navxweyî ji yê biyanî pirr erzantir e.

REKLAMA WE

Rojnameya Rûdawê bi erzanî reklam û peyamên we dighîne bi hezaran sermayedar û xwendevanên kurd.

Serî li me bidin:
Buro: +49 (0) 221-26 00 4002
e-mail: info@rudaw.eu

www.arsivakurd.org

Kakeyî êşa xwe ji cihanê re vedibêjin

Köln (Rûdaw) - Di vê dema dawî de rojnamevanê baskî Karlos Zurutuza serdana gundekî Kakeyiyan bi navê Elî Seray (190 km li bakurê Bexdayê) kiribû û reportajek ji bo ajansa nûçeyan IPS amade kir. Reportaj bi spanî û înglîzî ji aliyê bi dehan malperên nûçeyan ve, ya dawî Aljazeera English, hate weşandin û di medyaya civakî de eleqeyeke mezin dît. Reportaja bi navê "Cihê ku simbêl dikarin bên wateya jiyan an mirinê" ronahiyekê dide ser Kakeyiyan, ola wan û zilma ku li ser wan hatiye kirin.

Zilamên Kakeyiyan bi simbêlên xwe yên siq û dirêj têne naskirin, lê ev simbêl di wê atmosfera tundiyê de ku tê de dijîn wan dikin metirsiyê jî, nemaze jî ku ew ji aliyê tundrewan ve weke "gawir" têne dîtin. Tê zanîn ku Kakeyî agahiyên derbarê ola xwe de nadin kesên ji derveyî ola wan, lê sedemeke vê yekê jî heye: "Me tometbar dikin ku em detayên derbarê baweriya xwe eşkere nakin, lê ev şêweyeke ji bo ku em xwe ji neyartiya derdorê biparêzin", wisa Casim Reşîm Şewzan, yek ji gundiyê Elî Serayê, vê sedemê vedibêje û wiha pê de diçe: "Em li Rojhilata Navîn dijîn, cihê ku demokrasî nîne, ne jî azadiya derbirînê, cihê ku maf lê tine ne".

Reportaj herwiha behsa siyasetmedar û rewşenbîrê navdar Felekedîn Kakeyî jî dike, yê ku di 31ê Tîrmeha borî de çûbû ser dilovaniya xwe, ku wî "pirek di navbera Kakeyiyan û hikûmeta Herêma Kurdistanê de saz kiribû". Seed Selûm, edîtorê kovara Mesarat, li ser dokumentekirina pirrengiya li Îraqê dixebite. Seed dibêje: "Ji sala 2003yê û vir de em Îraqî me ji nû ve pirrengiya xwe kişif kir. Lê em vê yekê weke nîşaneke zengîniyê ji bo nasnameya xwe napejirînin. Îro tirsa me ya ji cîranê me bêhtir e ji tirsa me ya ji mûşeyekê yan jî ji çekên wêrankirina mezin".

Peyamnêrê IPS amaje bi wê yekê dike ku pirraniya Kakeyiyan bawer dikin ku ewlehiya wan wê baştir be eger gundên wan bikevin bin kontrola hikûmeta Hewlêrê. Kesekî ji gundiyan bi navê Sirwan, ku nobetê digire, dibêje: "Eger li dawiyê fersendekê bidin me, ji bo lidarxistina referandûmekê, da ku em di bin kontrola Hewlêrê de bin ya na, emê bi girseyî bêjin erê".

Karnameyên partiyan ne bi dilê jinan e

Terze Ebdulla
Silêmanî

Naxuye ku rola jinan di darişṭina karnameyên lîest û hêzên siyasî de hebe, ji ber ku di pirraniya karnameyan de jin û kêşeyên jinan nebûne babetên sereke. Di karnameyên hinek berendam û partiyan de amajeyeke kêm bi kêşeyên jinan hatiye kirin.

Perwa Elî, ku yek ji berendamên lîsteya Goran e, got: "Di her propagandayeke hilbijartinan de çend dirûşmên beloq hene ku giring in ji bo civakê, ew dirûşm giring tên wergirtin. Partiyên ku desthilatdar in û yên dijber jî dixwazin hejmareke herî zêde ya dengan kom bikin, da ku bikarin bi rêya bernameyên xwe zêdetirîn kursiyan bidest bînin."

Perwa Elî piştrast dike ku dirûşmên herî beloq yên hemû aliyan dirûşmên siyasî ne: "Yek ji kêşeyên sereke yên civaka kurdî kêşeyên civakî ne ku mixabin giringî bi wan nayê kirin. Pirsên civakî yek in ji wan pirsên giring ku hikûmet bi xwe divê bibe hokarek ji bo çareserkirina wan."

Derbarê wê yekê de ku di nav dirûşmên lîste û aliyên siyasî de reformên civakî û nehiştina şîdeta li dijî jinan nînin, Perwayê got: "Di pirraniya lîsteyan de reforma civakî heye, lê mijarên siyasî bûne kêşe. Eger na, di civaka kurdî de reforma civakî yek ji meseleyên giring e." Di nava 4 salên borî de parlementoya Kurdistanê pirr kêm pirsa şîdeta li dijî jinan xiste nav karname û rûniştinên xwe de, tevî ku ji sedî 25ê endamên parlementoyê jin bûn.

Hinek jin dibêjin ew kêfxweş in ku wêneyên berendamên jin bi dîwaran ve zêdetir bûne, lê Nermîn Kawanî dibêje: "Tenê tijîkirina kursiyan e. Hejmara berendamên jin hema bêje weke ya berendamên mêr e. Rast e, wan hewl dane ku kar ji bo jinan bikin, lê karekî pirr kêm kirine, ji ber ku ew xemsar in û kes guh nade wan. Lewma dibêjim ti karekî berçav nehatiye kirin ku dilê min xweş bike."

Li gor berendamê lîsteya Azadî, Beyan Mihemed, pîvana pêşxistina her civakekê girêdayî kêşeyên jinan e: "Her partiyeke ku kêşeyên jinan nexe bernameya xwe de û hewldanan jê re neke, êdî ew partiyeke paşverû ye. Eger parlementoya bê kêşeya jinan neke kêşeyeke sereke, ti guherîneke berçav rû nade."

Elif jibo Şandina Cenazeyan
أليف لخدمات دفن الموتى
مساعدات فورية في حالة الوفيات
Arina Travel Berlin
Reisebüro Transport
ŞABAN ÇITLAK
الإيصال حتى الوطن / الرعاية والاستشارة
Blaschkoallee 73
12359 Berlin
saban.citlak@gmx.de
Peywendîkirin bi kurdî
030 569 769 45
0179 675 40 21
TEL: 030 915 943 94 FAX: 030 287 084 05 MOBIL: 0176 215 111 73

Parêzer Uzun Buroya Parêzeriyê
Em li seranserê Almanyayê di xizmeta we de ne
Reklam
Beşên me yên kar
Dadweriya Kar (Arbeitsrecht)
Dadweriya Aborî (Wirtschaftrecht)
Dadweriya Trafîkê (Verkehrsrecht)
Dadweriya Werzîşê (Sportrecht)
Dadweriya Peymanê (Vertragsrecht)
Dadweriya berpirsiyariya pizîşkî (Arzthaftungsrecht)
Parêzer Oktay Uzun
Navnîşan:
Sonnemannstr. 3
60314 Frankfurt am Main
Tel.: 069 – 49 600 87
Fax: 069 – 49 600 88
email: info@kanzlei-uzun.de
web: www.kanzlei-uzun.de

PARÊZER / RECHTSANWALT
Bariş Yeşil
Tel.: 0231 - 95 01 85 40
Fax: 0231 - 95 01 85 41
Mobil: 0177 - 17 60 359
Schwanenwall 5
44135 Dortmund
info@ra-yesil.de
www.ra-yesil.de
PARÊZERÎ Û ALÎKARIYA WE BI ZIMANÊ ME

Nargîle jî penceşêrê çêdike



Kişandina nargîleyê bi taybetî di nava civakên li Rojhilata Navîn de gellekî belav e. Ev çanda fêrbûnê roj bi roj di nava ciwanên li Ewropayê dijîn de jî belav dibe. Gellek kesên nargîleyê dikişînin jî di wê baweriyê de ne ku ziyanên wê ji yên kişandina cixareyê hindiktir in. Lê lêkolînên di vê bareyê de van îdiayan piştrast nakin, tam tersî wê.

Bi taybetî germkirina nargîleyê ya bi komirê bi xwe jî ziyanê digihîne tenduristiyê. Madeyên zirarmend yên di nava kumirê de bi kişandina dûyê di nav de di nava laş belav dibin û ziyanê digihînin tenduristiya mirov. Li gor lêkolînên Enstîtuya Nirxandina Rîskan ya Almanyayê (BfR) kişandina her şûşeya nargîlê beramberî 10 cixareyan e.

Herwiha nîkotîna di nava titina nargîleyê de dibe sedema pêgiriyê, ango mirov bi nargîleyê ve tê girêdan. Di nava wê de jî maddeyên mîna arsen, krom û nîkel yên ji bo çêbûna penceşêrê metirsîdar jî hene. Li gor heman lêkolînan, ev made bi rêya nargîleyê ji cixarê behtir xwe di nava laş de belav dikin. Ji ber van hokaran, kesekî ku demdirêj nargîleyê bikişîne, jiyana xwe zûtir bi metirsiya bilind a nexweşiyên kezeb û penceşêrê re rû bi rû dihêle.

Dendikên kundiran saxlemiyê dipijiqînin

Dendikên kundiran ne bi tenê tehma xwe xweş in, ew herwiha ji hêla saxlemiyê ve jî bi fêde ne. Di nava wan de ji fosfor û magnezyumê bigirin, heta gellek cureyên hêsin jî hene. Herwiha taybetiyeke dendikên kundiran jî ewe ku ji bo tedawîkirina depresyonê jî baş e û dibe sedema xewa xweş jî. Di nava her 100 gramên dendikên kundiran de 30 gram proteîn hene. Vîtamîna E ya di nav de jî çerm xweşik dike. Li gor hinek lêkolînan jî, dendikên kundiran pêşiya çêbûna kevirên di nava gurçikê de jî dibire. Dohnê dendikên kundiran ji bo avrijandina rehet ya dema prostatê jî dibe alîkar.

Zû bi zû petatên di cemedê de nexwin

Xwarinên ku bi cemedê tên parastin, dikarin bibe hokara çêbûna penceşêra prostatê. Di encama lêkolîneke li DYAyê de diyar bû ku bi taybetî kesên hefteyê carekê van xwarin dixwin, wekî petatên ji nav cemedê, ji kesên din zûtir bi penceşêra prostatê dikevin. Herwiha metirsiya wan a ketina bi vê nexweşiyê ji ya kesên mehê tenê carekê xwarinên bi vî rengî dixwin ji sedî 35 bilindtir e. Ne tenê sorkirina van xwarinan, herwiha germkirina wan jî dibe sedema çêbûna madeya bi navê acrylamid. Li gor gellek lêkolînan ev made dibe sedem ku mirov zûtir bi nexweşiya penceşêrê bikeve.

Ji hêla din ve, dema dohnê ku petateyên ji cemedê di nav de têne sorkirin zû neyê guhertin, madeyên nû yên ji tenduristiyê re ne baş diafirin. Ev madeyên di nava dohnê nepaqij de diafirin jî dibin sedema metirsiya nexweşiya penceşêrê.

Xaçepirs

Çeperast: 1- Edalet, mafdarî, dadgehî – Serserî, zugurd, eware. **2-** Şêwe, şikil, cûre – Destnîşana kesê duyemîn – Mirov pê bi dûr re diaxive, hacetek axavtinê. **3-** Hestîyê devê mirov, pê xwarin tê cûtin – Hemdemî, serdemî – Ji ber, êdî, ji bo ku. **4-** Welatê Grekîyan, Yewnanîstan – Bangêr, kevirê ku banê xanîyên axî tê rastkirin. **5-** Dendik, dendikên nava fêkîyan – Bide, bide min, bîne (berepaş). **6-** Bersiva bangkirinê, hîna – Mesqere, kilê bi rûn, dermanek kozmetîkê. **7-** Cendek, neaş, laş (berepaş) – Henek, laqirdî. **8-** Nîşan, keramet – Kes, şexs. **9-** Navekî zilaman, dilxwaz – Kesên ji Amedê. **10-** Ji vir û pê de, ji vir û şûn de – Ehmeqî, bêaqilî, serkerî (berepaş).

Serejêr: 1- Mehkeme, dad – Navekî jinan. **2-** Nezera çavan, temaşe – Nîvxav, tam nekeliyayî, bi taybet ji bo hêkan tê gotin (berepaş). **3-** Bêjinga mezin (berepaş) – Bi qîm, dil xweş. **4-** Barack Obama serokê wê ye (berepaş). **5-** Di sosyolojîyê de kêmnetewe, grûp. **6-** Notayek Muzîkê – Hestîyê nerm ê lingê heywanan – Kesên ji Tataristanê. **7-** Navekî zilaman, yekrêz (berepaş) – Notayek muzîkê. **8-** Bergeh, meqam, pile (berepaş) – Şewq û ruhnîya herî xurt û bi xeter, çeka şewqê. **9-** Navekî jinan – Ast, bergeh, derece. **10-** Navekî zilaman – Xeter, rexne. **11-** Cûre, şikil, boyax, awa. **12-** Notayek muzîkê (berepaş). **13-** Rûn, tewaş. **14-** Yan, yan jî. **15-** Notayek muzîkê. 16- Êdî, ji ber vê, ji vir û pê de.



Bersivên hejmara 215



www.arsivakurd.org

Rojbûn an jî şahiya te ye û tu jî dixwazî wêneyê xwe li vir bibînî? Ji me re bişîn: info@rudaw.eu

Şevîn, Ozan û Umud



Şevîn (3), Ozan (6) û Umud (9) xwişk û birayên hev in. Diya wan ji Batmanê, bavê wan ji Kerboranê ye. Bi malbatî li Frensayê li bajarê Dreuxê rûdinin. Her du salan carekê diçin welêt. Hersê baş li hev dikin. Şevîn carnan niheqiyan li birayên xwe dike, lê ji ber ku ya biçûktirin e, birayên wê lê nagirin. Ango ew wisa dibêjin.
Hersê jî li Dreuxê hatine dinê. Di malê de zimanê wan ê axaftinê frensî ye. Umud kurdî fêm dike û kêm diaxife jî. Ozan jî hin gotinan. Şevîn tenê heya pêncan dihejmêre û navê endamên laş dizane.
Di hewşa wan de bizineke wan bi navê "dînê" heye. Gava çepilên daran didinê, bizin radibe ser herdu piyên xwe yên paş. Ew û Şevîn weke heval in.
Li Dreuxê malbat xwedî gellek xizm in. Hejmara zarokên kurd di temena wan de ji bistan boriye. Zarok li benda wê ne, ku dê û bavên wan fêrgeheke vekin, da ku ew hînî ziman, çîrok û listikên kurdî bibin.

Hûn dikarin navên fêkiyên jêrê di nav qûtîkan de binivsînin?

Biyok, Gêlaz, Încas, Mişmiş, Gundor, Hirmî, Lîmon

HEJMARAN BIGIHÎNIN HEV Û WÊNE BIRENGÎNIN

www.arsiv.org